

RABÛN

sal: 1
hejmar: 1
gulan - 1975
biha: 2 - DM

Organa BAHÖZ - Rêxistina Têkoşer û Şoreşgerên Kurdistan

BAHÖZ - Kürdistan Devrimci Militanlarî Organizasyonû Organî

NEWROZ



SERKETIN Û SERDESTÎ YA GELÊN BINDEST E.



"Bend 3 -

Saziya me bawer dike, ku wek hemî gelên dinê, ji mafê gelê Kurd e ku xwe bi xwe bigerine. Da ku bikariye bigehê vê armancê, divê ku gelê Kurd mafê çarenûsa xwe bexê destê xwe. Saziya me bi dest xistina vî mafî ha yî demokratîk û gelêr merceke bingehîn dizane..

XWENDEVANÊN DELAL,

Kovara RABÛNÊ ji vir û ha de ê her ji du mehan carekê derkeve. Heke rojek ji rojan şîyan û imkanên me hebin, em ê wê di demeke hîn kurtir de bighînin destên we.

Jîn û domdariya kovarekê, herdem bi xwendevan û hogirên wê ve girêdayî ye. Bi peydakirina şîyan û imkanan, xwendevan û kiryarên, alîkarî û dan û standinan ve kovarek xwe bi xurtir û têr nave-roktir dike.

Îro di vê rewşê û gehînekê de, piraniya karkêr û belengazên Kurd yên li derveyî welêt, ji nûçe û bûyerên Kurdistan ne agadar in. Sed mixabin, ku heta niha ji bo wan tu kovar û rojnameke dûhevî, bi rêk û pêk derneketiye. Jên derketine jî, piştî çend hejmaran yan xebata xwe rawestandine yan jî ji armanca xwe derketine der. Ji xwe, eger lingên xebat û têkoşîneke siyasî û şoreşgêrî ne di nav hemû ref û rivdên gel de be, keftelefa wê wek rehên darek hêşin nebe, serketin û xwegirtina wê pir dijwar e.

Em bawer in ku karkêrên Kurd bi rengekî pir bêdadî û nemirovî, ji aliyê sermayedariya ewrûpî tîrêşandin. Xwîna wan bi çavsorî tîr mijandin. Ne tenê karkêrên Kurd, lê belê hemû karkêrên cîhanê di nav çerxa sermayedariyê de tîrêşandin.

Ji lewra hewceye ku ew bîrê hîşyarkirin û tîgîhandin. Ji bo vê jî, xebateke xurt û sazkerî pêdivî ye.

Saziya me, ev barê ha yê giran hildaye ser milên xwe. Lê pê bawer e ku ev xebat bêî alîkarî, hevalbendî û tevkeriya heval û hogiran pêşvenakeve. Ji ber vê yekê em ban we dikin û dibêjin:

- * Rabûnê belav bikin û bidin xwendin!
- * Jê re kiryar û alîkarvan, dost û hevalbend peyda bikin!
- * Jê re binivîsin, nûçeyan bighînin!
- * Rabûn ê dengê rabûna gelê Kurd li dijî zorkarî û koledariyê nas bikin!
- * Wê li dijî her reng emperyalîzmê, nedadî, nemirovî, xwîn-mêjî û faşîzmê bizanin!
- * Xebat û têkoşîna wê ya xwe bipejirînin!

Hûn kovara RABÛNÊ dikarin ji vê navnîşanê peyda bikin.

Box 400

S-751 06 Uppsala 1

SWEDEN

RABÛN, li benda alîkariya te ya bi her rengî ye. Piştî xebat û têkoşîna wê bigre û xwe jê dûr mexe!

Postgiro-Postkonto Nr.

79 45 86-8

Me ji mêj ve dil hebû ku em rojnameke kurdî-tirkî biweşînin. Lê sed mixabin ku ev xwesteka ha, heta niha nehat cîh. Sebeb jî ev bû, ku rewşa diravî (malî) ya saziya me dest ne dida û ev bar ranedigirt.

Nemaze li derveyî welêt, çapkirin û weşandina zimanê zikmakî yê me, gelekî dijwar e. A yekê, bi tîp nivîsên çapxanê, rastnivîsandina kurdî pir zor e. A didwa jî, ew li ser mirov gelekî biha rûdine.

Dibe ku ji hin kesan re ev pir hêsan bête xuyan, lê di rastiyê de ne wisan e. Ew ne tenê xebat û xwe westandina çend saetan e. Jê re karekî giran û serêşî divê. A girîngtir (mihîmtir) ew e, ku ew divê ne ji bo xwenîşandan û hevberî (reqabet) lê belê ji bo armanceke pagîj derbikeve. Ew divê li dû hev, bi rêk û pêk bête weşandin. Ne ku pirs û gotinên xwe neyne cîh, xwe bi xwe bixapîne. Ji bo vê yekê jî, me biryar (qirar) da, ku em li gor şîyan û karînen xwe, kovareke piçûk û dumehî derbixînin. Em vê kovarê, ne ji ber rîk û îdiayekê, lê ji bo ku bikaribin Kurdan hişyar û wan xwedî doza xwe bikin, diweşînin. Wek me di rûpelê pêşîn de jî gotiye, nexesma karkêrên Kurd yên li derveyî welêt, ji nûçe û bûyerên welatê xwe ne agadar in. Ew di nav gelên dereke de, ji deng û zimanê xwe bêpar in.

Dil dixwest ku, xebata bi vî rengî li welêt bihata gerandin û ji nav gel bipejîqiya. Lê hikûmetên nijadperest yên faşîst, ev çend sedsal in, pêşiya vê rê û rêçê girtine. Devê gelê Kurd, li her ciyî hatiye kilîtkirin û girtin. Zimanê wî hatiye girêdan. Ew, ji yek ji mafê xwe yê mirovîyê hatiye bê par û peşkî kirin.

Celê Kurd û zimanê wî jî, yek ji gel û zimanên cîhanê ne. Ev gel jî, wek hemû gelan, xwedî maf e ku xwe bi xwe bigerîne û zimanê xwe bi kar bîne. Piştî hinde sedselî nenivîsandina kurdî, divê em mêji û aqilê xwe, bidin serê xwe û bi zimanê xwe binivîsin. Windabûna ziman û çandekê (kultur), windabûn û bizirbûna gel û welatekî ye.

Ji ber vê baweriyê, kovara me ê giraniya xwe bide ser zimanê kurdî. Lê qasî hindê jî, em pêşiya nivîsandina bi zimanên din nagirin. Em rê didin her kesî, ku bikaribin gotar û nivîsarên xwe di vê kovarê de bela bikin. Nemaze gotarên (mîqale) siyasî yên di derheqa pirs û kêşeyên civata Kurdan de, dê bibin sebebên destpêkirina lêhûrbûna pirsan.

T Ê D A Y Î

<u>Nivîsar</u>	<u>Rûpel</u>
Xwendevanên Delal	2
Rabûn Çima Derdikeve	3
Hem li Nal e, Hem li Bizmar e	5
Bêî Şilovekirin	6
Ne bi 33, lê bi 333 Guleyan ve jî	7
Quncika Nivîsevanên Kurd	8
Newroz	10
Ermeni Katliamî	11
Xatê Xanim	12
Dîktatoriya Şah Domnake !	15
Emperyalizma Emerîkî	17
Şoreş im	19
Pêşmerge	20
Mermî ve Bombalar	21
Gundê Mêrxasan	24
Yekê Gulanê	28
Weşanên Bahoz	29
Şerê Azadî , Memo	31

Heçî maena RABÛNê ye, di vê gehînek û qonaxê de, gelekî mezin e. Dibe ku hin kes bipirsin û bêjin, "Ma piştî vemirandina Şoreşa Panzde Salî?.." Belê, di diroka têkoşin û rizgariya gel û welatekî de, rabûn û desthelanîn, dijwar e ku raweste û vemire. Ji vê re, meşqeke ronak û xuya tevgerên gelê Kurd in.

Kurd, ev çend sedsal in, ku bi destên dijminên çavsor û xwînrej tî perçiqandin. Kurdan, berî zayînî (berî ji dayîk bûna Hz. İsa) û piştî zayînî, li cîwarê xwe yê îro de, pir împaratoriye û dewlet saz kirin û çekirin. Lê ew, geh bi xwe xwe li hev diketin û geh jî, bi destên dijminên kavil û weranker dihatin hilweşandin, ji nav rakirin. Tûnebûna otorîteyeke navendî (merkezî), xurtbûna derebegitî û feodalîzmê rê ne dida ku Kurd bighên gehînek û qonaxa gelbûnê. Ne tenê ev, lê hebûna pîrbendî û dijminahiya di nav gelên rojhelata navîn de û jihevduriyên (tenaqûz) civakî, aborî û siyasî dibûn sebebên pêknehatina yekîtiya Kurdan. Nexesma xir û cira didwan, demeke dûr û dirêj dom kir û dawî nehat. Ji lewre jî, împaratoriye tî sîtemkar û talanker, ji bo nerevandinê keyse, cara pêşîn di sedsala 15 an de li hev rûniştin û welatê Kurdan di nav xwe de parvekirin.

Welatê me Kurdan, pir caran bi destê dijminên vegirker, bi hovî hat talan û tajan kirin. Rojîne hebûn, ku li welatê Kurdan kevîr li ser kevîran nemabûn. Gund û bajarên Kurdan, bajarvanî (medeniyet) û afirandinên gelêr ji binî ve hatin hilweşandin. Çavên dijminên ku Kurdistan bi erdê ve kiribûn yek, ji van jî tîr nedibûn, dest bi kuştin û vebirîna rûniştvanên welatê me dikirin. Ji lewre, divê em bizanibin, ku îro her bihosteşke axa Kurdistan bi xwîna lawên wê ve hatiye avdan.

Lê ji van bûyerên ha malxiraptir bûyer, di destpêka sedsala 19 an de qewimî. Ew jî, bi destê emperyalîstên rojavayî, di nav çend dewletan de perçekirina Kurdistan e. Wan emperyalîstan, xwe jî zû de, ji bo vê pekanîbûn. Ji lewre jî, wek ava bin kayê, bi dizî, li hev hatin. Di çaxa jêrbûn û ketina împaratoriya Osmanî de, gelên bindest, xwe yeko-yeko ji zorkerî û bindestiya Osmanîyan rizgar dikirin. Lê, berî ku Osmanî ji nav rabin, perçê mayî ji aliyê emperyalîstên rojavayî hat vegirtin û li hev parvekirin.

Mistefa Kemal, ku pêşeng û nînerê (temsîlcî) nijadperestê (ırkçı) Tirkên faşîst bû, bi hosteyî, oldarî (dîndarî ji xwe re kir mifteyeke, ku her dergehî veke. Wî, bi kar anîna oldarî û bi qamçî kirina hîsên gelêr ve, hemû hêmenên (unsur) burjuwazî û gelparêz û ji xêncî van hêzan jî, hêzên pêşverû, dij-emperyalîst û gelên bindest di rêza xwe de birêxist, civande hev û li dijî "Gawiran" şer kir.

Di nav Kurdan de, xurtbûna oldariyê rê nedida, ku Kurd ji bo azadî û rizgariya xwe hêzên xwe bi kar bînin. Wan, dewsa ku xwe rizgar bikin, bi Mistefa Kemal xapiyan û ji bo serketina wî, xwe dan gorîkirinê. Lê Mistefa Kemal jî, di demeke kurt de, rûçikên xwe yên faşîstî û diranên xwe yên qîlkirî bi Kurdan nîşan da. Wî, bi milyonan Kurd kuşt, ajot û Kurdistan bi erdê ve kir yek.

Ev kurdkujî, ne tenê li Tirkîyê, lê herweha li Îraqê, Sûriyê û Îranê jî, bejn û bala xwe nîşan da. Paşê jî, dest bi pişavtina (asîmîle kirin) Kurdên ku "bi tesadîfî" sax mabûn kirin. Ew pişavtina ha ya nemi-rovî, heta niha jî her domdar e. Qasî hindê zorkarî û xwînwarîyê, dijminan ne dikarîbûn, ku Kurdan bi carekê re ji "riwê dinê rêçbikin" û "reha wan bigelînin"...

İro, derketina RABÛNê ji vê re îspat û nîşan e, ku zaroyê şoreşvan û welatparêzên vî gelê tengezar, dixwazin deng û awazê wî yê azadî û rizgarîxwazîyê bi cîhanê ragihînin. Bî a me, bersiva (cevaba) pîrsa jorîn, di vê de ye...

RABÛNê BIXWÎNE û BIDE XWENDIN !

Hem li nal e hem li bizmar e

DEMIREL, NİNERÊ SERMAYEDARÊN MEZİN,

TU CAREKE DIN BI XÊR HATÎ !

Belê Demirel, berdevk û bervedêrê sermayedarê mezin, tu careke din û ji dil bi xêr hatî ! Ev çend sal bûn, ku em ji "inci" û pêkenînen te bêbehr mabûn. Lê niha, kêfa me gelekî xweş e û em dilşa ne. Ji ber ku em dizanin tu ê me û hemû cîhanê bi bersivên xwe yên wek; "ûs yok tesis var" têr bidî kenandin. Bi gotineke weha ve jî, tu ê bi kêmanî çend salan saltanata xwe bidomîni. Tu jî dizanî, ku mirov ê bêî saltanata te, zû kal û pîr, bêmîrêz û rûtirş bibe û dilê xelkê ji xwe bihêle. Lê hebûna te, van kul û kovanên ha yên giran ji nav gel radike û te dike "benîştê devê xelkê" û babeta sohbet û axaftinên civatê.

Gelo tê bîra te, ku bi minasebeta serdaneke hikûmeta "Gecekondu" ya Bexdê, ku bi alîkariya we dixwastin "Kurdên Rêbir" û "Melayê sor" ji nav rakin, te li ser pirsekê weha digot; "Allaha çok şükür ki bizde ne Kürt var ne de Kürt meselesi ki, Irak'ın saygıdeğer heyeti ile Kürt meselesini görüşelim..."

Belê Demirel ! Bi a te û we, xwedê ew "mexlûq li welatê" we "ne afirandine", ku ji we re jî bibe "görüşme meselesi". Lê ji bîra te neçe ku tu û hevalên te, hun her roj ve "bölücüler meselesini incedon inceye gözden geçirmiş" dikin. Ew jî nebe her şev, di vî warî de xewna dibînin. Herçend "Türk süngüsünün gözüktüğü yerde, Kürt meselesi yoktur" jî, bawer dikî ku ev "hesap" ê di "Mahkeme-î kübra" de bête dîtin ?

Belê "sülük Süleyman" ! Dibêjin, ku tu di van çend salên dawîn de, ji ber ku ji cîhê xwe hatibûyî dîrxistin, gelekî li ber xwe ketiyî... Lê a rastî, mirov hiç bawer nedikir, ku tu hinde "cahil" mayî... Metirse cenabê Demirel! Herçendî tu, ano "sülük Süleyman", ne bi kincên sivîl li wî cîhî rûneştibûyî jî, hin "çoban Sülü" yên din, lê bi kincên pîrpirk û "umuzu kalabalık", lê hatin rûneştandin. Bawer bike, ku wan ji te pîr baştir ji "vatan ve millete hizmet" kirin. Ew "teşqeleyen" ku tu bi çendî-çend salan ji binî dervediketî û te jê re çare nedidî, wan di nav çend rojan de "ülkenin yüksek menfaatları uğruna" hel kirin û nehîştin. Tu divê dilhênik û dilniya bî, ku ew cîh û meqamê te yê kevn, ji te nehate sar kirin. Ew, bi trûbe û borîyên xwe yên ku bi zirbavên te ve hatine girêdan, av û bixara germkirî, ji wir dianîn û pê ew cîh germ dikirin.

Belê Demirel yê bi rêz! Nebe ku ji bîra te çûbe, ku tu gul û kulîlka sermayedarên mezin î. Nebê-nebê ku tu dev ji wan û zirbavên xwe berdî ! Gotin û methelokeke bapîr û dapîrên te heye, ku dibêjin; "insan yemek yediği sofraya bıçak saplamaz" Heke tu hewqasî nankor û cilqetîn bî, divê tu bizanî ku "teşqeleyen" mezin ê derkevin pêşiya te. Ano, ê careke din "kaxazekê" têkin destên te û "teskera" te bidin. Wê gavê hem tu û hem jî "belengazê berber Nuh" ê "bêkar" bimînin. Ne tu êdî dikarî resmên xwe tev "Conson" bikşîni, ne jî berber Nuh dikare "porê" Nazmiye xatûnê "ıslıyor, tarıyor ve yapıyordu" bike.

Belê Demirel, malxîrab û malneavayo ! Ji te re gotin, ku tu divê nijdeya (çete) xwe ji nû ve saz bikî. Lê ne weha ! Ma ne heyfa navê te ye, ku tu gurên boz ji xwe re dikî hevrê, ku bi kulm û boksan ve sûretê cenabê te biçirînin. Lê te jî wek "sofi Erbakan", peyva "zaman" ji tersê ve xwend. Lê belê divê mirov te ji alîkî ve jî pîroz bike, ku te hevalbendekî wek "Feyzioglu" helbijart. "Feyzioglu" yê "Kayserili", ku kerên ji te standî boyax dike û dîsan difroşe te. Helal be ji vê "buluş" û "zeka" te re...

Belê Demirel ê "su mühendisi" ! Wek navê xwe yê "desthesinî", divê tu jî, "balyoz hareketi" ji bir nekî. Tu dizanî cigir û hevalên te ew çilo û çawa anin cîh û tetbîq kirin. Ji xwe, destên te bi rastî hesinî ne... Bi wan ve, careke din serê Kurdan, karker û kedkaran, zane û xwerdekaran, welhasil hemû "mexlûqan" bişkêne û wan bikuje. Ji bir meke, ku ev roj roja te ye! Keys, keysa te ye! De, "bileğine kuvvet", lêde bavo can !

Beî Şilovekirin

Rojnameya EL-HAYAT ya libnanî, 27.04.1975, rûpel: 6, hejmar: 9217

"Di derheq serdana wî ya roja sêşembê de"

SEDAM HUSÊN: WELATÊN EREBÎ NABIN KOMİNİST-JÎ BER KU KOMİNİZM LI
DIJÎ YEKÎTIYA EREBAN E

Bexda: 26 AŞA-A/B.R.-Alîkarvanê serekê Encumena Serekîtiya Şoreşa Îraqê
ê roja sêşembê, jî bo serdaneke çar rojî, li ser vexwandina Emîr Ebas
Hûweyda serekwezîrê Îranê, here Îranê. Ev serdana ha, yekemîn serdan e, ku
karbidestekî Îraqî î di vê bilindahiyê de, cara pêşîn diçe Îranê.
Di gel Sedam Husên de Se'dûn Himadî, wezîrê derveyê Îraqê, jî here. Di
vê serdana çar rojî de, karbidestên herdu welatan ê li ser xurtkirina
dan û standinên di navbera herdu welatan û herweha li ser lihevhatina
Cezayîr, ya ku di meha avdarê de binî hatiye nivîsandin, bipeyîvin.
Kaniyên diplomatîkî yên Îraqê hêvî dikin, ku Şahê jî alî serkomar Eh-
med Hesên El-Bekîr were vexwandin. Ev jî, piştî hilweşandina monarşiya
Îraqê, dibe yekemîn serdana Şahê Îranê. Di dawîya meha avdara derbazbû-
yî de, Emîr Ebas Hûweyda, bi serdaneke resmî hatibû Îraqê. Herdu alî jî,
ji hev û jî lihevhatina Cezayîr razibûn û dilxweşbûna xwe, di danezana
hevparî ya ku piştî serdanê hate eşkere kirin de, dan diyar kirin.

Komînizm û Yekîtiya Ereban

Sedam Husên, jî nûçedarekî (mixabîr) rojnameya Kayhan re dide beyan
kirin, ku 'di van 20 salan de, jî Kurdên rêbir (eşqîya) 10 hezar kes ha-
tine kuştin... Rejîma Îraqî jî Kurdan hez dike. Çawa dibe ku mirov hej-
çavekî xwe neke? Em ê hewil bidin, ku rewşa Kurdan biguhêrin û alîkari-
ya wan bikin...' Li ser pirsekê, Sedam Husên weha bersiv dide; 'Divê em
bizanibin, ku komînizm li dijî yekîtiya Ereban e. Ez hiç bawer nakim, ku
rojek jî rojan, li welatekî erebî komînizm pêkbê. Ji ber ku welatên
erebî, tenê jî bo gelê Ereban û tenê jî bo şoreşên erebî ne...'

**Başbakan Pramoj, Tayland'ın Komünistlerin
oline düşmeyeceğini açıkladı**

Demokrat İzmir, 25.05.75 BANGKOK —

Tayland başbakanı Kukrit Pramoj, Tayland'ın komünist-
lerin oline düşmeyeceğini açıklamış ve bundan sonra

Vardıkları "Af" sözüne rağmen

Irak'ta 38 Kürt idam edildi

Günaydın, 20.05.1975

● Petrol bölgesi Kirkük'e yeniden yerleşmelerine izin verilmeyen
Kürtlerin büyük bir kısmı başka bölgelerde kurulan kamplara yer-
leştiriliyor. Bu Kürtler günde iki kez polise görünmek zorundalar.

BEYRUT (Günaydın
Dünya Servisi)-Irak Hükümeti'nin, 38 Kürt esiri
ve etkin çararlanmak için
başından geçen bir Kürt
komutanı ile birlikte bil-
dirilmektedir. Güvenilir
kaynakların bildirdiğine
göre, bu idamlar 25 mart
Kürt hareketinin yonit-
leşme politikası ve
Irak Hükümeti'nin Kürt-
ler için genel af ilan et-
mesinden sonra yapılan
ilk idamlardır.

Irak Hükümeti tarafın-
dan çıkarılan, "Af" a gü-
venerek topluluklarına ge-
ri dönmek için Irak' a
gelmiş Kürtlerden 38' ini
bu şekilde idam edilme-
si ve cenazelerinin Kürtle-
rin bulunduğu yerlere gö-
türülerek teğhir edilme-
si Kürtler arasında büyük
bir korku ve tepki yarat-
mıştır.

Kürtler bu idamlar
kargısında, "Onlar gerçek
hükümet kuvvetlerine kar-
şı daha önce savastılar a-
ma kendilerine verilen af
sözüne güvenerek Irak'a
döndüler. Bu durum kar-
şısında kendimizi nasıl
güven içinde görebiliriz",
demektedirler

Kürt müftecilerinin ye-
niden petrol bölgesi Ker-
kük'te yerleşmelerine iz-
nin verilmemektedir. Kürt
lerin çok büyük bir kısmı
kamplara yerleştirilmekte
ve Basa Partisi bu
kamplarda gubeler aç-
maktadır. Buna karşılık,
Barzani'nin Kürt Demok-
rat Partisi'ne ya da par-
tinin muhalif kanatları-
na bu kamplarda çalışma
imkânı tanınmamaktadır.
Beirut kaynaklarının bil-
dirdiğine göre kendi top-

raklarına yeniden yerleş-
melerine izin verilen Kürt-
ler bölgesindeki emniyet ma-
kamlarına günde iki kez
bildirim yapmak zorun-
dadırlar.

Hükümet yetkilileri,
idam edilen 38 Kürt'ün
siyasi suçlu olmayıp, adi
suçlardan ötürü asıldık-
larını açıklamışlardır.

**Suriye, Irak'ta
komünist avı
başladığını
öne sürdü**

ŞAM (Günaydın Dünya
Servisi)-İran ile anlaş-
maında Bağdat'ın komün-
istlerden uzaklaşmasının
da öngörülmesi bulunduğu-
nu ileri süren Suriye yet-
kilileri Irak Hükümetini
gizli bir komünist avına
girmekte suçlamışlar ve
son iki hafta içinde altı ki-
şinin idam edildiğini sek-
sen iki kişinin de tutuk-
landığını ileri sürmüşler-
dir

Günaydın, 21.05.75

* İRAK hükümet kuvvetlerine teslim
olarak Kürtler için affın stresini 30
hesaban'a kadar uzattı.

Milliyet, 21.05.75

Demokrat İzmir, 19.05.75
**"Suriye ile Irak arasındaki
gerginlik artıyor"**

Suriye ile Irak arasındaki
gerginlik gidince artmaktadır.
Her iki de, karşılıklı olarak
bildirmekte itihaf rejime idare
Suriye ile Irak arasındaki
bu çekişmenin hareket noktası
Fırat Nehri'nin hareket noktası
olması meselesi olmaktadır. Bu
mesele zımında bu mesele
çözümüne ulaşmaya seher
gözleri açıktır.

KURD NAYÊ PERÇIQANDIN

Tirkiyê, yek ji wan welatên faşîst e, ku di bin navê "demokrasiyê" de, azadî û serbestiya dide bin lingên xwe û tevgerên rizgarîxwazî û dadmendiya civakî bi zora cendirme û hêzên paşverû yên çekdar dide ve-mirandin.

Piştî dîristkirina rejîmeke faşîst e vekirî (1971-1974), bi deh hezaran têkoşerê gelên Tirkiyê hatin girtin. Bi sedan xortên birewer bi destê rejîma leşkerî hatin kuştin. Bêaramî û teror giha qonaxeke bilind e bê hesab. Lêdanên (îşkence) ku bi destê pisporên (mutedhasîs) emerîkî hatin kirin, heta niha li hîç welatekî nehatibû dîtin û bibîstin. Ji lewre di bin van lêdanên nemirovî û hov de, bi sedan kes mirin û xwedêdi (şehîd). Bi neçarî (cebren) xelk bi gilîkirinê hat hînkirin û gilîdar bi pere û krêdî hatin xelatkirin û bûn xwedî kursî. Kiriz û bûbrana aborî wisa kir, ku jîn li Tirkiyê di navbera çend mehan de %100-150 bîhatir bibe. Bihebûna her tiştî û bi ser de jî tunebûna kar belengaz û kedkarên Tirkiyê eşandin û ew derbeder kirin. Bi guhartin û qebûlkirina destûrên nû yên nedemokratîk, sazîkirina dadgehên (mehkemên) gelêr (!) û direjîkirina gerandina awarte (îdara orfî) ve domdariya faşîzmê hat garantî kirin. Ji lewre jî, emperyalîstên rojavayî û pisporên faşîzmê rê dan ku "helbijartinek" bête kirin, da ku ew xwe careke din bikin şûrkêş û bervedêrê demokrasîyê. Qasî hinde sîtem û zordestiyê jî, dîsan gelên Tirkiyê li dijî faşîzmê rawestîna xwe, bi helbijartina partiyeke niv-çep ve bi cîhanê nişan dan. Partiya niv-çep, ku ji Mîstefa Kemal ye xwînrejî mîras maye, bi vegirtina Qibrîsê û kuştina gelê yewnanî ve, xiyamet bi dengên gel kir. û armanca xwe a kirêt, zû da xuya kirin. Lê ev partiya han jî, dîsan bi destên sermayedarên mezin yên ku paşê Demirel kirin serekwezîr, ji hikûmetê hat dîrxistin.

Heçî pîrsa Qibrîs e, ku di bîngeh de, bi destê welatên emperyalîst tê sor û tûj kirin, ne pîrseke nû ye.

Xweşî û geşîya vî welatî, dostanî û bi hev re jîna herdu gelan, Tirk û Yewnanî di van salên dawîn de bi hostahî hatiye aloz kirin. Ji bo tiştên hîç û pûç, ji herdu aliyan bi hezaran kes hatine kuştin. Emperyalîzma emerîkî, nemaze piştî sazîkirina NATO, ku Tirkiyê û Yewnanîstan jî endamê wê ne, bi reya wan dixwaze girava (ade, cezîre) Qibrîsê jî xwe re bike binkeke (ûs, qai'd) leşkerî. Îngilîz, ku her jî berê ve, bi siyaseta xwe a "Vegetîne û bigerîne" ve navdar e, di vî warî de roleke mezin dilîze. Xebata van hêzên ha yên alozkar û mirovkuj bi ser ket. Di destpêka havîna sala 1974 an de, leşkerê faşîst ê komara Tirkiyê, Qibrîs vegirtin û bi hezaran Yewnanî bi hovî kuştin. Xwînrejî û nijadperestîya tirkî, careke din bejn û bala xwe rewani (nişan) da. Edî xortên gelê Kurd hişyar bûbûn û nedixwestin, ku xwe di reya nijadperestî û nedadî (bêadeletî) de gorî bikin. Ji ber vê yekê bû jî, 26 xortên Kurd, ku nedixwestin herin Qibrîsê û li wê Yewnanîyên belangaz bikujin, bi biryara (qerar) dadgehên gerandina awarte darvekirin. Ev jî, pîr bi dizî hat kirin, ku hişyarbûna gelê Kurd nemaze mildariya wî ya bi gelên tengezar re, dengvenede.

VEBIRÎNA (qetlîama) 33 AN YA DIDWA

Di diroka gelê Kurd de, rûpelîne tunene, ku ne bi xwîn hatibin nivîsandin. Her roj û her demeke wî, bûyereke (hadîse) xwînawî berpêş dike. Vebirîna Wêranşehr, ku wek kuştina 33 Kurdan bi navê revoktiyê (qaçaxçîtiyê) li bajarê Wanê, yek ji van bûyeran e. Di destpêka sala 1975 an de, cendirmên destbixwîn û mirovkuj, bi fermana zabîtekî ve, 20 kes li ser tixûb (sînor) kuştin. Piştî kuştinê jî, cemse û loriyên leşkerî li ser laşên wan tîn gerandin û ew di bin toterîkân (teker) de tîn perçiqandin, ku kes ji wan neyên naskirin. Bi vî rengî, Deştê Wêranşehrê jî faşîstên xwîn, nijdeyên (çete) nokeran re bû bêder û xerman.

Faşîstên Tirk yên noker û gelkuj, ji bîr dikin ku Deştê Wêranşehr, Geliyê Zîlan, Dêrika Çiyayên Mazî, Beyara Wanê û Panava Amêdê dê rojekê ji wan re bibe gor û goristan. Gelê Kurd dê rojekê tole û heyfa hinde wêrankarî, talan û tajanî, gelkujî û malşewitandinê ji nokerên xwînrejî û çavsor yeko-yeko werbigre.

DIROKÊ JÎ MEJ VE DIYAR KIRIYE, KU SERKETIN Û SERBESTÎ, HER Û HER YA GELEN BINDEST E...

FEQIYÊ TEYRAN

Feqiyê Teyran, çaxa ku di dîroka Rojhelata Navîn de bûyerên mezin û helez diqewimîn, hate dinê. Li alîkî zor û zordariya Xelîfeyên Erebî hêdf-hêdf ji nav radibûn û ji alîkî zor û zordariya veşirkerên (istilacı) ewrûpî yê Xîristiyan ji Rojhelata Navîn qewirandibûn. Lê veşirkerên dereke (xerîb) dev ji kam û armancên xwe bernedabûn. Wan bi navê "Mîsyonên Rûhanîyê" dixwestin, ku li wê ji xwe re cîwar bibin. Piraniya welatên Rojhelata Navîn ketibûn bin destên malbata Eyûbiyan. Hikumdariyên mîrê Kurdan, roj bi roj xurtir û bêztir dibûn. Bi hêzbûna wan re jî, rewşa rîvda (cîmasta) xebatkar û kedkaran gelekî neqenc dibû. Şer, destên pir xebatkaran ji kar dikir û ji şer re jî, gelek dihat me-zaxtin (serfkirin). Hinde barên giran, dibûn toqeke agirî û diketin sti-wê refa xebatkaran. Feqiyê Teyran, ev bîmafî û bêdadiya ku li rîvda xebatkaran dihat kirin, bi çavên xwe didîtin û xwe jê re gorî dikir. Ji ber vê yekê jî, piraniya nivîsarên wî, rewşa hêjar û belangazan didin ber çavan û jê dipeyivin. Di wan de, mîr, derebeg û dewlemend tînan tawan-bar û gunehkar kirin. Ew di helbestekî xwe de, weha dibêje;

"Ez dengbêj im hatim vira,
Heta hebin dengê mîra,
Ez ê binivîsim ser kaxeta,
Ne diçim dîra, ne mizgefta."

û;

"Şixulê zordestê mîra,
Xirab e halê me feqîra,
Kes guh nade jar û sefîla."

Herçendî li ser nivîsar û afirandinên Feqiyê Teyran re 600 sal der-bas bûne jî, dîsan wan di nav civata Kurdan de cihên xwe yê giran-biha wergirtine. Helbestên wî, cîdî bûne mal û samanên (milk) gelê Kurd. Heke afirandinên Feqî nehatina dîtin jî, dîsan mirov dikare wan jî nav zar û zimanê gel kom bike. Berî ku perçek ji afirandinên wî wek dîwanekê li Sovyetîstanê were çapkirin, ji xêncî Kurdên Sovyetîstanê tu kesekî helbestên wî yê çapkiri nexwendibû. Lê qasî hindê jî, her kesekî kurdperwer bi pîrî-hîndikî beytên wî jî ber kiriye û dizane. Di nav aheng û civînên civata Kurdan de, Feqî, herdem li ser zar û zimanê civatê ye. Feqiyê Teyran, bî pirtûk, kovar, rojname, weşan û we-şînekan, her gav bûye mevan û dildarê civata Kurdan.

Mezinahi û navdariya Feqî; di vê yekê de ye, ku ew hertim bi jîn, rewş û pergala civatê ve girêdayî bû. Wî herdem bi zimanê zelal yê civatê ve dinivîsand û ji lewre roj bi roj zêdetir diket nav ceger û hinavên civatê. Wî nedixwest, ku di dîwanên axa û mîran de rûne û bibe derdevk û peyayên wan. Feqî hevî û bala xwe dida ser hêz û hunermendiya refa kedkaran (zehmetkêş). Di vî warî de ew weha dibêje;

"Ew ê herdem werin bira min"

Jîn û temenê (emr) wî di demêke wisan de borî, ku keysên pêkanîna se-rectiyekê, ku bikaribûya civatê bide pey xwe û wê ji nîrên dîl û ko-letiyê azad bike, hin tunebûn. Lê dîsan jî Feqî bawer dikir ku dê ro-ja azad, rizgar û serfirazbûna refa kedkaran bêt.

Bi helbestên xwe ve Feqiyê Teyran helbestvanekî (şair) lîrîkî û di-lovaniya wî bê derece ye.

Her kî ku "Dota Gurcan" xwendibe, ew dizane ku Feqî di wê afirandi-nê (eserê) de, ne ku tenê bi hostahiyeke bê hempa û mezin ve bedewbûna "Dota Gurcan" ber pêş kiriye. Lê belê di wê de ramana (îdeolojiya) navgeliyê (enternasyonalîzmê) û ji civata destebirakên Gurcî hezkiri-nê neqîş dike. Heçî "Sêxê Senhaniyan" e, pîr bi ronshî û eşkere, se-

beb û hoyên dij-rûhanî û ateyîzmê nîşan dide. Di wê afirandina bedew û heja de, Şêx dibîne ku ol(dîn), kelem û sebebekî mezin e û nahêle ku ew bighê daxwaz û miradê xwe. Ji ber vê yekê, Şêx, wê dide bin lingên xwe û ji bo dilgirtî û dildara xwe berazan(xinzîr) diçêrîne. Feqiyê Teyran, di sala 1302 an de li Miksê, bajarê Çolamergê li Kurdistana Bakur, ji dayik bûye. Di dirêjahiya jîna xwe de, Feqiyê Teyran gelek helbest(şiir) nivîsandine. Kurdnasê heja A. Jaba, di derheqa Feqî de weha dinivîse:

" Helbestvanê sisyan ê kevn yê Kurdan Feqiyê Teyran e, ku navê wî yê rastîn Mihemed e. Di sala 1302 an de hatiye dinê. Malbata wî ji Miksê, welatê Çolamergê ye. 'Çiroka Şêxê Senhaniyan', 'Qiseya Bersiyayî' û 'Qewlê Hespê Reş' bi awayê mewzûn nivîsandiye. Ji bilî van, pir beyt û helbest bi rengên din nivîsandiye. Navê wî, di hin helbestan de 'Mîm û Hey' e, û bi qasî 75 salan jiye û di 1377 an de li Miksê binax kirine..."

Ji xêncî van gotinên kurdîzane giranbiha Alexander Jaba, mamoste Kamûran Bedirxan jî, di derbara Feqî û kesitiya(şexsiyeta) wî de, van rêzên jêrîn dinivîse:

" Gelo Feqiyê Teyran kî bû? Navê wî çi bû?... Ji ber ku Feqiyê Teyran leqebê helbestvan e û ne navê wî ye. Di dawiya 'Çiroka Şêxê Senhaniyan' de, nivîsevanê nisxeyê li erebî nivîsiye, ku: 'Qesîdeya wesfê Şêxê Senhaniyan, ku Mîr Mihemed nezil kiriye, tamam bûye. Ev Mîr Mihemed bi navê Feqiyê Teyran meşhûr e.'

Li gor vê şerhê, Feqiyê Teyran mîr bû û navê wî Mihemed bû. Lê mîrê kîjan welatî? Heye ku ji mîrên Miksê bi xwe be..."

Ji ber ku dijmin û xwînmêjên gelê Kurd, bi zorkerî û nemirovî çand (kultur) û diroka gelê Kurd her û her dipişêve(asîmîle dike) û keysa lêgerîn û nûjenkirina dewlemendiyên wî nade, wek pir tîstên din, di jîn û afirandinên Feqiyê Teyran de jî gelek tarîbûn hene. Lê em gelê xwe bigerin û wan ji hev derxin.

Ji xêncî wan afirandinên jêrîn, di arşîv û pirtûkgeha zanîngehên Sovyetistanê de, ev afirandinên ha yên Feqiyê Teyran jî hene; "Hevalê Sisêban", "Beytên Feqiyê Teyran yên bi avê re peyivîne", û hp... Em di vê quncikê nivîsevan û helbestvanê Kurdan de, çend rêzên Feqî pêşkêşî xwendevanên xwe dikin. Feqiyê Teyran mir, lê ew bi rûh û ramanên xwe ve, herdem di nav civatê de dijî.

MIHACIR

Ez dengbêj im hatim vira,
Heta hebin dengê mîra,
Ez ê binivîsim ser kaxeza,
Ne diçim dêra ne mizgefta.

Çolê bîmînim ez bê cil,
Ez ê bikim hewar û gazî,
Çiqas bîmînim hêsir û tezi,
Dil ji halê wan dileristî.

Çeder, ê bê rojek diyar,
Ê bê gotinê navê min ê jar,
Metha bidin car bi car,
Lawê bêjin bi kitêbê car,

Ê derbazbin rojên xefûr,
Ê bîn rojên qenc ên kibîr,
Xwe re bikin ra û tevdir,
Hêsir nebin ber zulma mîr.

Gul ê rabin bahar bahar,
Mêng ê şînbîn mîna hercar,
Avên kaniya bizên zela,
Ê tunebe Feqiyê dilsar.

Lê ez diçim xortên cahil!
Hezbikin! gerekê şerbikin timê,
Hezbikin hun jî jin, zaro û ahil,
Pêşiya mîra, pêşiya zulmê...

Ë BÊ ZEMAN

Kanê, niha nayê,
Dewran bêne dinyayê,
Em derên zora cefayê.

Dewraneke kefil-deman,
Soz û qîrar bibine tamam,
Lê kifş bike xas û xam,

Xas û xamê kifşkirî,
Rûnê û her bigirî,
Bona kara windakirî.

Zeman vegere bi dor,
Wê windabin cebir û zor,
Bende ê rabin gelek pispor.

Dema bê zemanê meriva,
Aqil ê bê mêjiwê seriya,
Ê bîr bînin Feqiyê Teyra.

DEWRAN

Me li wa dewran bi dor,
Gelek jor in, gelek bi jor,
Şixulê mîra timê bi zor.

Şixulê zordestê mîra,
Xirab e, halê me feqîra,
Kes rûh nade jar û sefîla,

Jar û sefîlê em dibêjin,
Derd û kula tev dirêjin,
Ji destê qûltiyê, ker û gêjin.

Ê bên dewranên ser û bin,
Tav ê bide ser serê min,
Heye we'da dirêj û kin.

Wexta ku bê we'dê şemal,
We'de ku bê, nade mecal,
Ê windabin derdên xedar.

Derdê keser, ger bê qeyas,
Bendê mehrûm bê sûc binyas,
Ji zor û zulmê, nabin xelas.

Her dewranên êdil werin,
Dilê tijî vedimalin,
Ne hewceyî pirsên sar in.

Qise ew e, bête gotinê,
Ku eyan be a'lem û dinê,
Dewranên baş bibine xinê.

Ê bên dewranên kibîr,
Namînin hakim û mîr,
Lazim e hingê benda tevdîr.



NEWROZ

Newroz, cêjneke gelêr e Kurd e û di dîroka gelê Kurd de cîhekî bilind û giranbiha wergirtiye. Ew jî, wek hemû rojên me yên gelêr (milî) xwedî maene û nîşanekê ye.

Ji alîkî ve Newroz, mizgîniya hatina xweşî, geşî û aramî û ji alîkî ve jî şahiya serdestî û rizgariyê (xelasbûnê) tev xwe tîne. Rojên sar û hişkî, şevên tarî û reş, erdên spî û qerqas bi hatina Newrozê ve reng û rûçikên xwe dighêrin. Çawa ku Newrozê rewşa (waziyeta) gel (xelk) û welatekî di dema xwe de guhart.

Lê Newroz ne tenê nîşana geşbûn û guhartina reng û rûçikên xweristê (tebîetê) ye. Ew giranbihayiya xwe û maeneya xwe ji guhartina rewş û pergala gel û welatekî werdigre. Ew serketina yekîtî û hevkarîya belengaz û hêjaran li dijî zulim û sîtemkariyê bi me nîşan dide.

Berî niha 2587 sal, hemû tengezar û bêçare, di bin ala balyoz û horsê hesinker KAWÊ de yek bûn. Wan bi vê yekîtî û rabûna xwe ve, serê Zihak yê xwînmêj û zorker dan ser horsê û bi balyozan ve pelçiqandin. Bi vî celebî, ew bîr û baweriya zordarî û xwînmêjiyê di bin lêdanên pir dijwar de pelixî û pûç bû. Ji lewre, Newroz ji me Kurdan re tiştêkî pir giranbiha ye. Ew roja me ya azadî û rizgariyê ye.

Herçendî faşîst û nijadperestên Tirk, Ereb û Ecem ev roj jî, wek ziman û çands (kultur) kurdî qedexe (yasax) kiriye jî, dîsan Kurd li Kurdîstana bi destên emperyalîstan perçekirî de, ve rojê bi yadkirineke bêhempa ve cêjin dikin. Ew li ser çiyên Kurdîstanê agir dadidin, pêtî, çirûsk û alavên jinavrakirina zordarî û xwînmêjiyê berdidin nav civatê...

GELÎ BIRANO-HEVAL Û HOCIENO!
CÊJNA WE YA NEWROZ PÎROZ BE!
ZORDARNO-XWÎNMÊJNO! DAWIYA WE NÊZÎK E.

ERMENİ KATLİ ÂMININ 60. YILINI ACI İLE ANIYORUZ

Bundan 60 yıl önce Türk şöven-ırkçılığı, 1.5 milyon Ermeni kardeşimizi hayvan keser gibi katletti. Bu vahşetin altmışıncı yılını yaşayan bizler, o geçen kara günleri lânetle anıyor. Kürt halkının Ermeni kardeşlerimizin acısını paylaştığını bildiriyoruz.

Orta Doğunun en eski halklarından olan Kürtler ve Ermeniler, asırlarca beraber yaşayagelmışlerdir. Çoğu kereler komşu hükümdarlardan zulüm gören Ermeniler, çareyi kendi öz kardeşleri olan Kürtlere sığınmakta bulmuşlardır. Tüm acı-tatlı anılara rağmen, her iki halk, dış emperyalist baskılara rağmen, birbirlerini korumayı görev adederek, tarihte eşine az rastlanılır dayanışma örneğini göstermişlerdir.

Ne yazık ki, Osmanlı İmparatorluğu döneminde gemiyi azıya alan kuvvet zoru ile toprak kazanma politikası, Kürt ve Ermeni dayanışmasını görmemezlikten gelmedi. Yıllar boyu süren provokasyonlar, nihayet meyvalarını vermekte gecikmedi. Kürt ve Ermeni halklarının gerçek düşmanları işgalciler, tarihte eşine ender rastlanılan jenosid planlarını tatbik koyuldular. Bunun sonucu olarak 1915 yılında, "Ermenilerin kökünü tarihten kazıma hareketi", en korkunç vahşeti ile boy gösterdi. Devrin ırkçı-faşist komutanlarından biri olan Enver Paşa, bir yandan "savaş alanını boşaltma" amacı ile, bir milyon Kürdü Batı Anadolu'ya cebri sürgüne gönderirken bir yandan da Ermenileri kılıç ve baltadan geçiriyordu. Bu huyhar katliam, Türk ırkçılığının vahşiliğine tipik bir örnek idi.

Nitekim ada geçen İttihat ve Terakkiçi Enver Paşa, Ermenileri kılıçtan geçirerek Bakü kapılarına dayandığında, muzaffer komutan edâsı ile şunları söyleyecekti: "Gelirken 20'lerin (1) hesabını gördük. Giderken ise 10'ların (2) hesabını göreceğiz. . ." Enver Paşa ve şerekâsı, kendinden olmayan milletleri asıp-keserek ülkelerini kana boyamayı bir şeref"(!) payesi adediyorlardı. Onlar, böylesi metodlarla Kürt ve Ermeni meselelerini hal edeceklerini sanıyorlardı. Oysa o halklar, günümüze kadar milli varlıklarını kıskançcasına ve de tüm karekteristikleri ile koruya gelmişlerdir.

Kürt halkı da, Ermeni kardeşleri gibi, yıllardır kendi kaderlerini serbestçe tayin etmek için savaşmaktadır. Bu halk, milli kurtuluşunu veren tüm dünya halklarından yanadır.

Bizler devrimci bir Kürt organizasyonu olarak, Ermeni kardeşlerimizin, Kürt-Ermeni dayanışmasını önleyen dış emperyalist ve de dahildeki gerici güçlere karşı çok uyanık olmalarını bekleriz. Ermeni katliamının 60. yılını anan kardeş Ermeni halkının acısını yüreğimizde hissediyoruz. Bu acının halkların milli kurtuluş ve de sınıfsal özgürlük bilincini bilemediği, şüphe götürmez bir gerçektir.

YAŞASIN KÜRT-ERMENİ HALKLARININ GERÇEK KARDEŞLİĞİ !

YAŞASIN KÜRT ve ERMENİ HALKLARININ MİLLİ KURTULUŞ HAREKETİ !

KAHROLSUN TÜRK İRKÇILIĞI ve ONUN İŞBİRLİKÇİLERİ !

KAHROLSUN FAŞİZM ve EMPERYALİZM !

(1)-20'lar ile Ermeniler kastedilmektedir.

(2)-10'lar ile Kürtler kastedilmektedir.

Not: Yukarıdaki metin, bu yıl Ermeni katliamının 60. yılını 24 Nisan günü Kaliforniya, Bonn, Paris, Atina ve Beyrutta anma törenleri düzenleyen Komitelere, organizasyonumuz tarafından bir mektup olarak gönderilmiştir.

XATÊ XANIM

Ev serpehatiya ha, me ji nav bejeyê nivîsevanên Kurdên Sovyetistanê helbijartîye. Kurdiya wê ji aliyê me hatiye rastkirin.

Dêrsim, di nav bajarên Kurdistanê de bajarekî mezin e. Meriv ê beje qey tebiyetê hawirdorên wê bi qestî bi çiyayên zencîre û hevgerêdayî ve afirandiye. Çiyayên Münzûr û Mircanê her dem bi kirasê spî ve hatiye nixumandin. Zencîrê çiyayên Mazgêrtê, Nazmiyê, Pilûmerê, Ovacixê, Kemaxê, Eginê mîna zincîrên kotanê bi hev hatine hûnandin. Weke ku mirov beje tebiyetê ew zincîr bi qestî qetandiye û tenê li çend ciyan rê daye rêwiyan ku ji bajarekî din werin wî bajarî. Ji lewre Kurd jê re di bêjin "Deriyê Kurdistanê" yan jî "Deriyê Zîv (Sîm)".

Li Dêrsimê bi hezaran gundê Kurdan hene. Ew qasî 138 êlên (eşîretên) kurdî di nav xwe de diparêze. Di nav wan de yên bi nav û deng Zaza, Kîka, Millî, Mirdêsî û Şikakî ne. Dîrok, bihevregirêdana wan a polayî pir caran dide îspatkirin. Dîrok dibêje ku çikas ordiyên dijminan yên ku ji rojhelatê an ji rojavayê hatine ser Kurdistanê, bi wan re li hev nekirine û nehiştine ku ew lingên xwe bavêjin Kurdistanê. Çiyayên Dêrsimê wek bira li piştê ciwariyên (binecihiyên) xwe rawestane. Fir laşên dijminan li wan cîhan mane û bûne xûrê (em) teyr û dehban. Kurdên li wê bi xwe, gelek kilam û lawje avêtine ser qehremanên xwe. Mêrxasên wan, ne tenê yek û dido ne lê belê Kurd hemû ne.

Oxxx..., bihar, havîn, payîz û zivîstana Dêrsimê çiqas xweş e. Ew Behîştê rastîne. Dema ku bihar tê Dêrsimê, çiya, gelî rast û berpâl kirasên hêşîn yê mexmerî li xwe dikin û dikimkimin. Ew ji wî kirasê gul, sosin, pêjek, beybûn, kulîlkên awazî serê xwe ji xewê bilind dikin bi hewa bayê re dikevîne govendê.

Ava kanî, çavkanî û berfan, ku ji çiyayên bilind tîne, tev li hev dibin, dixulxulin, çivan didine xwe û ber bi nimzayê û beyarê dikişin.

Mirov hewaskar dimîne ku hinekî li ba wan rûne, awaz û sazbanda wa çiyayên Kurdistanê, welatê Kurdên Dêrsimê guhdarî bike.

Heke ziman têkeve devên wan çiya û kaniyan ê gelek tiştan bêjin, lê heyf... Mirov bi dilekî paqij û bi armanceke pak li wan binhêre ê bi zelalî xuya be ku wan di dirêjahiya çend sedsalan de ji bo Kurdên Dêrsimê çiqasî ji destên vegirker û zorkerên Romê kişandine û dilê wan hatine birîndar kirin. Rûçik û dêmenên wan çiyayên zerbûyî wek şahidiyê li hemû tiştî bikin, awiran didin. Stoyên wan xar e, ku şahidiya xwîna Kurdan ya wek çem û kanî herikî dikin. Li ber her kevirekî wan lawên Kurdan ji xwe re çeper çêkirine, dijmin kuştine û hatine kuştinê. Qasî hindê jî, wan Kurdistan ji destên xwe bernedane û heta niha jî ew cîh bi Dêrsima Kurdan, ango dergê Kurdistanê yê ziv tê navkirinê. Dîroka Dêrsimê di pir sedsalan de şerkariya gele Kurd ya ji bo parastina hebûn û welatê xwe dide xuyakirinê.

Çiyayên Eginê ji zincîra çiyayên Dêrsimê yên paşraxistî ne. Wan pêşên xwe hem ber bi rojhelatê û hem jî ber bi rojavayê wek kulavekî xoristanî raxistine. Lê pêşa rojhelatê hingî bervejer diçe hewqasî vedibe û ji hespên kihêl yên Êrebistanê re dibe meydaneke fireh e kiraskirî. Ji rojhelatê ava kanî û çavkaniyan mîna mara ji dûr ve dibiriqin û ji jor de ber bi rastê dişûlikin û diherikin. Ji lewre ew bi xemla darên mêrxê ve hatine xemilandin.

Di hembêza çiyayên xumxumî û nay daristanên fireh û mezin de, li ser darên gwîzan, hirmîyan, sêvan, behîvan, bihan, qeleman, merxan, maziyan, şîlan, çaman, bilbil, teyr, çivîk, pepûk, kevok, teyr û tilûrên din deng didane hevdu. Mirov hewaskarê xêlekê rûniştin û guhdarîkirinê na sazbanda şalûl û bilbilan e. Ew deng û hewa paqij gelek rêwî şivan, berxvan neçar dikirin ku hinekî li wê rûn û bîna xwe vedin.

Hema di bintara wê daristan û qûntara pir kulîlkîn de, gundekî mezin cîwar bûbû. Navê gundê ku bi bax û rezên xwe ve wek bûkeke Kurdan hatibû xemilandin, Sincan bû. Li ser milê rastê yê wî gundî de xan û manên Têmûrê Elî hebûn.

Mala Têmûrê Aliyê Îsa, di nav êlên Kurd yê Dêrsimê de maleke pir mirovhez bû. Ew mal ji aliyê hebûnê de ne kesib bû ne jî dewlemend, ano xwedanê keda xwe bû. Di nav êlê de jî, para Eliyê Îsa nîvçe bû. Kurekî Elî hebû, ku navê wî Têmûr bû. Têmûr jî mîna bavê xwe tu ferq û cihêti nedixiste nav mirovan û ji kesib û belengazan gelekî hez dikir. Heke axakî an jî begekî heqê rêncberekî nedaya, ew diçûn ba wî û giliyê wan li ba wî dikirin. Têmûr bi giregiran re dikete şer û dozê, heta ku îş û karê wî kesibî rast û durist nekira, dest ji wî giregiri venedikişand. Nav û dengê Têmûr ne ku tenê li Sincanê, lê belê di nav kesib û belangazên Dêrsimê de jî bela bûbû. Kesiban ji wî gelekî hez dikirin. Lê axan gelek caran xwestibûn ku Têmûr bidine kuştinê, lê ew yek ji wan re li hev nedihat. Têmûr ne tenê li axan lê herwaha li hikûmeta Romê jî xweş nedihat.

Têmûr merekî pir bi aqil û fêriz bû. Mala mêran ne şewite, çito mêr bû ew... Rîşiyên destmala kolozê, yê bi şar û şemaşiyên ve neqîşandî diketine ser eniya kever û reng didane bejna wî ya wek dara rihanê bilind, navmîla pehn, devûriwê zirav, simbêlê reş ê qeytanî mirov hewaskar dihiştin ku li bejin û bala wî merî binhêre. Çendî çend qîz ji bona bejn û bala wî bi evîndarî şewitîn. Nêçîrva-nekî pir sekvan bû, guleyeke wî ne dibû dido.

Bav û kalên Têmûr hetanî kutasiya emrê xwe, ji bona nebindestîya Kurdên Dêrsimê, li hember dewleta Romê bi mîrxasî şerkirine. Bi serdariya Têmûr, eşîretên Kurd yê Dêrsimê çendî-çend caran alayên Roma reş tarûmar kiribûn. Wan cih û warên xwe ji vegirkeran re ber-nedabûn. Ji ber vê yekê bû jî, dewleta Romê ji Têmûr heznedikir. Wan dixwest ku wî hertim ji Kurdan veqetînin, yan sirgûn bikin, yan jî bikujin ku bikaribin Kurdên Dêrsimê binin ser reya qanûnê û di demê de xerc û xeracên xwe berhevbikin. Lê ev yeka ha ji dewleta Romê re li hev nedihat. Çaxa ku Têmûr zor dida Milazimtiya Dêrsimê û li hember wan şer dikir, ji aliyê Paşê Romê bi qestî dihate lêborandin. Lê pîrsa wan ya lêborandinê dirêj nedikişand, ew dîsan digirtin û sirgûnî Yenîçeriyê dikirin. Rom ji tevra bûna Kurdên Dêrsimê ditirsîya ku Têmûr bikuşta. Ji ber ku serekên eşîran hiç nebûya heftê carê-du caran diçûne serdan û dîtina Têmûr û pê re mişewre dikirin. Lewre jî ji wê yekîtiya Kurdan ditirsîn û nediwêribûn Têmûr ji nav rabikin.

Têmûr piraniya emrê xwe, di dewa û dozan, sirgûnan de der-bazkiribû. Êdî wî xwe nedida destê dewleta Romê. Qasî hindê jî, Têmûr di nav eşîretan de dîsan xwedî desthilat (selahiyet) bû.

Têmûr herdem şîret û amûzgarî li kurê xwe yê 10-12 salî dikir, ki ew mezin be, diyê mîna bav û kalên xwe xwîna xwe ji bo nebindestîya Kurdan birêjîne. Sultan zarokekî jîr û aza bû. Ew por kur-rîşkî, lêv sorik, diran mircanî, serçav sor û bi bejin û bal bû. Bavê wî hîn di zarotiya wî de, ew hînî gule agir kirinê rê û dirban dikir. Heke Sultan nikaribûya li nîşana xwe bixe, bavê wî bi dev û lêvên şekirîn dikişîya û digot; "Nizanim, ku Xatê Xanim te ji ku anîye? Tu ne ji dol û toya me yî..." Dikişîya û eniya wî radimîsa. Dema Sultan ev gotin dibihîştin, di hundirê xwe de diqîçqîçî, dikeliya û di dilê xwe de hêrs dibû. Êdî çend gule bavîtana hemû vala diçûn û li nîşanê nediketîn. Wê çaxê Têmûr di bin simbêla de vedibeşirî... Têmûr, Sultan hînî cirêde, nêçîrê dikir û carcaran jî ew bi xwe re dibir nav êlê û digerand, ku ew ji hingê ve fêrî her tiştî bibe.

Sultanê Têmûr êdî mezin bûbû, her rê vedibjart û bûbû dar û stûna Kurdên Dêrsimê û bavê xwe. Wî jî wek bav û kalên xwe, xwîna xwe ji bona xwedîkirin û parastina Kurdan dirijand. Kulfetê Têmûr ne ew qasî giran bû. Pîreka wî Xatê Xanim, kurê wî Sultan û bûka

wî Zeynê bûn

Di emr de Têmûr nêzîkî pêncê salî bûbû. Ew ji zulim û zêran-
dina Romê hey caran nexweş diket û hey caran baş dibû. Rojek ji rojên
meha gulane nexweşiyê ew zeftkir. Hawar û heydade ket nav eşîrên Kurd
yên Dêrsimê. Hemû giregirên êlan di demeke kurt de li mala Têmûr li
hevdu civyan. Di nav wan de xinamiyê wî Emîn Paşa yê casûs û sîxur jî
amade bû ku Walîtiya Dêrsimê ji mirina Têmûrê Elî yê Sincanî agadar
bike. Têmûr ketibû ber nezîr û sikrana mirinê. Wî carcaran çavên xwe
vedikir û li civatê dinhêrî, razîbûna xwe ji civatê re diyar dikir
û digot: "Sipas ji vê rojê re û hezar sipas, ku êla min bi mêrxasî li
hember Roma reş şer kir û me xencera xwe di piştê dijmin de çikand,
ne ku wan di piştê me de..."

Herçendî Têmûr li ber sikranê bû jî, çavên xwe vekiribûn û li
dor xwe dinhêrî û beşera wî xweş dibû. Wî ban rûspiyê êla Mîlan Miste-
fayê rîspî û bermaliya xwe Xatê Xanimê kir. Bi hemû hêzên xwe ve xwe
civande hev û got: "Min derxînin derve. Ez dixwazim cara davî bi çavên
xwe çiya, gelî, qelaç, dar û daristanên Kurdistanê yên Kurdên mêrxas
bibînim. Paşê min dîsan vegerînin hundir..." Mistefa û Xatê her yek
ketin bin milekî wî û ew derxistin derve. Wî bi çavên xwe yên dûrbî-
nî ve, cara paşîn, Dêrsima mêrxas mêze û raçav kir û ji Xatê Xanimê re
got:

-Gelo Romê dîsan êrîş ne aniye ser me û destên xwe dirêjî
welatê me nekîrine?

-Na, divê tu bawer bî û piştê te xurt be.

-Baş e, ez ji we bawer dikim. De wekî wisane bilezînin min
bibînin hundir. Serê min dêşe... Ji ber ku min xortaniya xwe de ev cîh
hemû dîtibûn. Niha di nav van çend deqîqan de ku min li derve li
welatê Kurdan yê şêrîn mêzekir xortaniya min hat bîra min. Ew
hemû niha li ber çavên min tên û diçin. Gişk bi yeko-yeko tên bîra
min... Ax xortanî... Ax Kurdistana Kurdan ya bi xêr û bêr...

De bi xatirê te!...

Têmûr anîn jor û kirin nav nivînan. Çend balgehên nerm dan ber pala wî
û wî dîsan li civatê niherî. Di nav hemîyan de zêdetir bala xwe dabû
Xatê Xanimê, ku mirov digot qey ê gotinên xwe ên dawî yên gulsoşînî
bi ser wê de bibarîne. Ew ê qewîtiyên xwe yên dawî jê re bêje û
rojên tal û tengasiyê, ku bi hevdu re kişandibûn, lê helal bike.
Paşê Têmûr serê xwe bilind kir û bi dengê melûl ban kurê xwe Sul-
tan kir û got:

-Sultan, ronahiya herdu çavên min. Ez ê bimirim. Qewîtiya min
li te ew e, ku tu koloze bavê xwe bilind bigrî û li piştê civatê raw-
estî. Wisa bike, ku rûmetdarî û zanyarî di nav civata me de bela be.
Ji bo wan li hember zorê şer bike. Wisa bike, ku zulim û zordarî
di nav civatê de nemîne. Zulmê li xelkê meke. Baş bizane ku heke tu
zor û zulmê li civatê û xelkê bikî dê hestiyên min di gorê de bile-
rizin. Qewîtiyên min divê ji te re guharên zêrîn bin.
Rojê din ew li gorê tore û edetên Kurdan, bi destê êlên Kurdên Kîkan,
Mîlan, Mirdêsiyan û Zazan hat binaxkirin.

Eliyê Evdirehman

Eliyê Evdirehman nivîsevanekî Kurd î Sovyetistanê ye.
Di sala 1920 an de li Kurdistana Bakur û li bajarê
Çersê ji diya xwe bûye. Piştî ku Roma reş (Tirkên fa-
şîst) vebirîn û kuştina Kurdan kir, wî keys dît ku
xwe bi saxî bavêje axa Ermeniyên li Sovyetistanê. Eliyê
Evdirehman heta niha pir serpêhatî, helbest, çîrok, gotar
û roman nivîsandîye. Yek ji afrandinên wî yên bedew
"Gundên Mêrxasan" e.

Perçek ji wê romanê di vê hejmara kovara me de heye.
Ew ê di nav weşanên me de jî, wek pirtûkekê were çap-
kirin û belakirin.



**pey nawî bo şehîdî weten sîwen û girîn
namrin ewan wa le dili miletan ejîn**

Li Îranê jî, giraniya barê rejîma dîktatoriye û zilma Şahîngah ya aborî (îqtisadî), siyasî û civakî (îçtimaî) li ser milên gelê Kurd bû. Piştî bi fêlbazî kuştina Zapatayê Kurdan Îsmail Axa Simko, tevgerên din yên Kurdan jî, wek; Liberxwedana Êla Swîsnî û Êla Menguran, hatin vemirandin. Serokê Êla Swîsnî Koyxan Homer Paşa û serok eşîrên din, wek; Emîr Eshed, Elî Hecî Elxanî, Qerenî Axayê Mameş hatin girtin û kuştin.

Êdî ji zilm û zokeriya dîktatoriya Îranê re heb-hesab tunebû. Zimanê kurdî, kinc û cil, folklor, dîrok û çanda kurdî hatin qedexekirin. Wek Tirkên tûranî li Tirkîyê dikirin, wan jî li dayrên resmî çerçiwên "Ji xêncî fari-sî bi zimanên din peyvin qedexe ye" nivisandî dadilîqandin. Zor û mirovkujiya cendirme û leşkeran, dikete nav kilam û stîranan, ji guhan derbazî guhan dibû. Vê zilmê tesîreke mezin jî li ser rewşa siyasî ya Kurdistanê dikir. Di wê demê de, tenê hin ronakbîr, feqî û melayên hişyar jî vê rewşê agadar bûn û wan, bi dizî di nav xelkê de, xebata xwe dikirin.

Hîn di sala 1930-37 an de saziyeke piçûk li Kurdistanê Rojhelat pêkhatibû û dan û şandina wan bi Şoreşa Ararat, Xoybûn û saziyên Kurdên Îraqê ve jî hebû. Di vê saziya piçûk de, navdarê Kurdên zane yên çaxa şerê cihanê ye yekan hebûn. Ji xêncî Qazî Mihemed çend Kurdên ji Kurdistanê Îraqê jî, wek; Şêx Ehmedê Sirîlawî, Qazî Kake Hemey Bokan, Mela Mehnûd Sadiqî Qizilcî, Mela Ehmedî Fewzî û hp., ku di dema şer de jî bajarê Silêmanîyê hatibûn, hebûn. Di bihara 1941 an de Leşkerê sor yê Sovyetistanê ket bakurê Îranê û hêzên Bîrîtanyayê jî ketin başûrê Îranê û ew hindam vegirtin. Leşkerê sor yê ku Kurdistan vegirtibû, bi belavokên kurdî rûniştvan jî rewşê agadar dikir û

DÎKTATORIYA ŞAH DOM NAKE !

Di dîroka Kurdan de, her roj xwedî maene û nîşanekê ye. Roja 31-ê avdarê jî, yek ji van rojên şinê û reşgirêdanê ye. Serî 29 salan, di vê roja reş de, serkomar (reisêcîmhûr) Qazî Mihemed û hevroyên wî bi destê faşîstên Şahîngahê Aryamehr hatin darvekirin. Bi vê qewimandinê ve, gelê Kurd li Kurdistanê Rojhelat, navê çend xwedêdiyên (şehîd) din li karwanên xwedêdiyên nemir û dilovan zêdekir...

Dema ku faşîzm û hêzên xwînrej yên Hîtler, bi çargavî, pêşve diçûn û welatên hawirdorên xwe vedigirtin, ji dil û baweriya gelê Kurd li Kurdistanê Rojhelat çirûskeke pêti dipijiqî. Ev çirûska jî, nîşana azadî û rizgariyê, li hember faşîzm û zokeriyê rawestin bû.

Herçendî şerê cihanê ye didwan gelek welat kavi û wêran kir û bi milyonan mirov kuştin jî, di sê hêzê emperyalîst û faşîstan bi zîrar derketin. Serê faşîzma Hîtler, li her cihî, hat pelixandin û emperyalîzmê li pir ciyan kelehên xwe windakirin. Dinya sosyalîst firehtir û hêzên demokrat û pêşverû xurtir bûn. Pîraniya welatên Ewropa Rojhelat, ji vegirkerên Hîtler hatin rêç û paqîjkin. Li wan welatan, rejîm û hikûmetên nû hatin sazkin.

Li Asyayê, tevgerên rizgariyê pêşdetir diçûn, gelek welat dibûn xwedî serbixwebûna xwe ya siyasî û hikûmetine gelê (millî) pêk dianîn.

di nav wan de xebata siyasî pêk dianî. Leşker û zendirmên hikûmetê ji bo ku xwe rizgar bikin, çek û silahên xwe bi erzanî difrotin an jî davêtin û berve Tahrane direviyan. Bi saya serê vê bazdan û revê, hemû rûniştvanên herêman Kurdistan û Azarboycan çekdar bûn.

Di 1942 an de, zane û ronakbîrên Kurdan li bajarê Mihabadê civyan û saziyek pêk anîn. Saziya Jiyanewey Kurd, di demeke pir kurt de xwe di nav Kurdan de hûnand û dest bi xebata hişyarkirina wan kir. Lê ji vê jî girîngtir, di roja 16.8.1945 an de, hemû hêzên Kurdistanê Rojhelat gihan hev û hîmên Hizbî Demokratî Kurdistanê avêtin. Bi hemû dengên (oy, rey) ve, Qazî Mihemed serekê wê hat helbijartin. Ev, di dîroka Kurdan de yekemîn car bû, ku liparçekî Kurdistanê partiyêke siyasî dihate sazîkirin. Partiyêke gelparêz e demokrat, kurdî û xwedî armanc, stratejî û taktîk...

Di nav civata Kurdan de xurtbûna derobegiti û feodalîzmê, rê da ku refên feodal têkevin nav rêz û gerandîna (îdare) partî û bibin xwedî desthilat (selahiyet). Lê heçî Qazî bi xwe, ku ew jî ji malbateke mezîna feodal bû, giraniya xebat û bala xwe dida refên gundî-cotkar û ronakbîran. Ji bilî van, rola mele û feqîyan jî di nav Jiyanewey Kurd, Hizbî Demokratî Kurdistanê û Hikûmeta Millî de, gelek meşin bû.

Qazî hinde xir û ciran jî, Partî, li Kurdistanê Rojhelat yekemîn hêza siyasî bû ku ji gelê Kurd re rêberî û pêşengî dikir. Wê bi pêkanîna eniyêke (cephe) gelê (mîlî) ve, dijminahî û pîrbendiyên di nav el û eşîretan û Kurdan de ji nav rakir. Wê, di demeke pir kurt de hej û peşên xwe da. Giraniya xebat û têkoşîna xwe da birêxistin, têgihandin û perwerdekirina Kurdan ku ew ji tevgerên rizgarî û dij-faşîstiyê neyên cemidandin. Li milêkî, gelên cîhanê yê bindest hişyar dibûn û li milêkî din jî hêzên faşîst, erîşên xwe yê dir û wêranker xurtir dikirin, ku gerandîna cîhanê têxin destên xwe.

Tiştêkî din î girîng jî, Kurdên Îraqê di bin serekîtiya Bêrzanî de, li hember Îngilîz û Îraqê şer dikirin. Lê hêzên hewa yê Îngilîstanê (RFA), Kurdistan bi bomban şewitandin û şoreş vemirandin. Lê Kurdên mîrxas û cengawer, derbazî Îranê bûn û çûn alîkariya birayên xwe.

Xebat û keftelefte gelê Kurd, roja 22-ê çeleya navîn 1946 an de bi danîna komara (cîmhuriyet) Mihabat ajda. Di bin serekîtiya Qazî Mihemed de, di dîroka Kurd de cara pêşîn bû ku hîmên komareke kurdî e demokrat û serbixwe dihat avêtin. Komara Kurdan, nişanek jî nişanên rizgarî û azadîxwaziya gelê Kurd ya li dijî zordarî û xwînmêjiyê bû. Wê xwe bi vê bir û baweriyê ve bi hêz kir û bû keleheke xurt û tund li hember faşîzm û emperyalîzmê. Di wê çaxê de, cara pêşîn bû ku çand, huner, folklor, bêje û zîmanê kurdî bi hemû hebûn û dewlemendiya xwe ve geş bû û giranbîhatiya rûçikên xwe ber pêşî gelên cîhanê kir. Ne tenê ew, lê pir tiştên din xwesteka xwe ya serbestî û pêşketinê nişan dan. Perwerdekirin û şerê nezaniya Kurdan, perçiqandin û eşandîna kedkar, cotkar, jin û hp., di wê çaxê de giha pêpelûk û qonaxêke bilind. Hinde têkoşîn jî bo pêşketin û pêşveçûna civata kurdî, dilên dijminan nexweş kirin û xwîna wan cemidandin. Ji ber ku hebûna komara kurdî û hişyarkirina gelê Kurd li her çar perçeyên Kurdistanê, ne tiştêkî kêfdar bû. Xurtbûna keleheke dij-faşîzm û emperyalîzmê, jar û lawazbûna ref û sinifên stû-stûran bû. Ji hemû gelên rojhelata navîn re meşqê serfirazî û azadiyê bû. Pêşveçûn (tehlîke) mezîna û bê derece bû.

Ji lewre bû ku di demeke kurt de hêzê emperyalîstên cîhanî gihan hev. Bi saya serê plana Marshall û doktirîna Truman, hevî û ronahiya gelê Kurd yê di rojhelata navîn de, kulîlka nûbişkivî ya Kurdistanê hat çilmisandin. Çilmisandîna vê gula nazenîn di dilê gelê Kurd de birîneke kûr û bêderman vebû. Hêzên Şahîşahê Îranê bi alîkariya emperyalîst û hevkarên Hîtlerê faşîst ketin Kurdistan û ew kavi û wêran kirin. Zar û zêç, kal û pîr, jin û mîr, xort û ciwan jî singoyên reş yê hîtlerî derbaskirin û serê wan bi hêzên çekmesor ve pelixandin. Wan, lehengê gelê Kurd, serkomar Qazî Mihemed (1901), Sedrî Qazî (1908) nînerê komara Mihabat di Meclîsa Şûreyê Millî Îran de, kurapê Qazî û wezîrê liberxwedana Kurdistanê Heme Hîsênxan Seyfî Qazî, di roja 31.3.1947 an de li meydana Çarçîra li Mihabadê bi darvekirin. Çavbixwînen rejîma Şah, wilo bawer dikin ku ew mirin. Lê di rastiyê de, ew her di dilên gelê Kurd yê azadîxwaz de dijîn. Baman û xebata wan, îro jî hemû Kurdan re nişaneke rûmetiyê ye. Ew nişan e her û her biçirûse...

EMPERYALİZMA EMERİKÎ JI HEV DIKEVE...
VIETNAM RIZGAR BÛ, BIJÎ VIETNAMA YEKBÛYÎ !

"Ew, ji bo bi hêz û dijwarkirina şerê vegirtina Vîetnama Başûr (cenûb), dikarin 500.000, milyonekî yan jî hîn bêtir mêrî seferber bikin. Ew, ji bo zêdekirina bombe barandinê li ser Vîetnama Bakur (şîmal), dikarin bi hezaran balafir têxin şerî û bi kar binin. Bi qasî hindê jî, ew ê tucaran nîkaribin dilxwaziya rizgariya gelê Vîetnamê ya li dijî êrişên Emerîkayê jar û lawaz bikin. Mirovkujî û hovîtiya wan çiqasî dijwartir û xurtir be, ew ê hewqasî gunehkar û tawanbar bin. Dibe ku şer 5, 10, 20 salan yan jî hîn dirêjtir bidomîne. Dibe ku bajarên Hanoi, Haiphong û hinekên din bên kaviil û wêrankirin. Lê dîsan jî, gelê Vîetnamî nayê tirsandin û ziravên wan nayên getandin. Ji azadî û serbixwebûnê giranbihatir û delaltir hîç tiştekî din tune. Kînga ku em di şerî de bi ser ketin, dê gelê me, welêt ji nû ve, bi avaniyên ji niha mezintir û spehîtir, ava û sên bike..."

HO CHÎ MINH

Gelê Vîetnamê, ku yek ji wan gelên piçûk yên dinyayê ye, ku di dirêjahiya dîroka hebûna xwe de li dijî emperyalîstên xwînrej û vegirker, ser kiriye. Çendî-çend çil û nîfsên wî di serî û şoreşê de mezin bûne. Ho Chî Minh, ku yek ji wan ciwanên welêt e, ev gotinên jorîn, di dema xurtbûna bombe û wêrankirina Vîetnama Bakur de, bi mêrî û cesaret, ji xelkê xwe re gotiye. Sed heyf û mixabin ku ev camêr û mêrxasê ha yê gel, rêber û çêkroxê welêt, bêt ku serketina partîzanên xwe bibîne, mir. Lê ew herdem wek pêt û çirûskekê di mêjiyê her welatparêzekî û li ser her cîhên welêt bûbû ronahî, rê bi wan nîsan dida. Ev kalê 80 salî yê rîhspî, di gel vê kalbûna xwe, hêviya xwe ji serketinê qutnekiribû û bawer dikir ku ew gelekî nêzîk e.

Di 3-ê meha îlona 1969 an de, ev gernas mir. Ew, bi dilaramî û dilniyayî ji gelê xwe veqetiya. Wî, di qewtînameya (wasiyetname) xwe de, bawerî û hêviya xwe weha êşkere dikir:

"Emperyalîzma emerîkî ê sedî-sed rojekê ji welêt bête gewirandin. Welatê bav û kalên me ê sedî-sed rojekê dîsan bibe yek. Hemwelatîyên me, çi li Bakur û çi jî li Başûr, ê sedî-sed rojekê di bin banekî de dîsan bigên hevdu..."

Sedsala bîstan, sedsala sersîkandin û binaxkirina zordar û vegirkeran e. Zordar û emperyalîstên ku welatên piçûk û paşveketî xistine bin destên xwe, ji aliyê wan welatan ve, ji welêt her roj tîne gewirandin. Ew welatên xwe yên sirîn, ji wan gemar û kirêtan paqij dikin û vedimalin.

Gel û welatên piçûk, li dijî vegirtin û xwînmijiya welatên xwe her roj di liberxwedana xwe ya gelêr de pêşve diçin û bi ser dikevin. Ew, her roj, piştî welatên dêw û hêzên mezin yên hov û xwînrej li erdê didin û dişkênin. 17 û 30-ê meha nîsanê, yek ji wan rojan in.

Kamboçya û Vîetnam, ku du welat û gelên piçûk yên Asya Dûr in, di şerê rizgarî û azadiya xwe de, emperyalîzma emerîkî ya xwînwar bin kirin. 17 û 30-ê meha nîsanê, di dîroka êrişbir û dest bi xwîne emperyalîstên Yekîtiya Dewletên Emerîkayê (YDE) de, rojên res û sersoriyê ne.

Kavilker û êrişbirên hov, dehbe û dir yên emperyalîstên YDE-ê, hembertî û dahata çavsoriya xwe, ji dilsozên rizgarîxwaz wergirtin. Ev ne tenê ji emperyalîzma YDE-ê re, lê belê ji hemû cure emperyalîst û vegirkeran re fêre (ders) û amûzdaneke (imtîhan) mezin e. Fêre û amûzdaneke, ku tucaran ji bîr neyê kirinê...

Di 17-ê meha nîsanê de, hêzên şoreşger yên Kamboçî keleha emerîkî ya li welêt hilweşandin û ala serketinê lê çikandin. Ev bûyera ha, mizgînî dida gelên din yên Hindocînavê. Piştî çend rojên

Dumahlik neye

din, ano 30-e nisan, azadixwazen Vietnamê serê talanker u werankeren emiriki li baygane belixandin. Ew serê ne bi xer, wisan hat belixandin, ku careke din ji xwe candar nebe.

Rizgarîya Hindocîna, ji hemû gelên Hindocîna bîndest yê çîhane re, meşqêke giranbîna ye. Di lomanî, dilovanî, dilsozî u tevgerê rizgarixwazen Hindocîna ye, nemaze ji gele Kurd re, lewêke beraye u be hempa ye. Di lewê hewceye, ku em li dîroka tekosîna wan hatin u le bikolin.

Di sedasê 18 an de kolodaren Fransî Hindocîna vegirt u Vietnam, Kambojya u Laos kirin bin destên xwe. Wan ji alîki de tixu- ben(sînor) di nav van herê welatan de rakir u ji alîki de ji li gor sîyaseta "berge bîke u bîgerîne", lewîtiya wan bi tîj u sor kirina ci- hetiyên candî(kultur) u olî(dînt) ve, tekdîda. Bi ve ve, kolodaren de Fransî dixwestin, ku van welatan di bin gerdandîna xwe u kolodariye de bîhînin. Le dîm ji, di van welatan de, heta 1914 an rabûn u liberxwe- danen li di ji kolodaren Fransî ramewestîna ji ber ku jîranîya van tevgeran, tevgerên gerdare burjuvazi u rabûnê zane u ronakbîran bûn, nedikarin gundî u cotkaran bîdîn ber xwe. Min ji we gaxe ve, nûçî u karakterê bi herê tekosîna gelên Hindocîna, xwe dîyar kir. Kolodaren Fransî, di vî marî de, di hîşyar u gawekirî bûn, wan di bergekîtin u jarkirina ve lewîtiya de, di ji dest hat kirin u bi ser ji ketin. Ji ber ve lewê ku kolodariya Fransî saltanata xwe li Hindocîna de- mandîya. Tevgerên zane u ronakbîran burjuvazi yê rizgarixwaz, ku ji sazîyekê(tekilat) xurt u tekuz bepar bûn, ji lewê ji, heta 1914 an, di rengekî gore nîjdevanî(gete), beja-bejayî domêr bûn u vematîna.

Ji xwe, di ve gîrînekê de, li her çîhî nexweme li Afrîka u Asyaya, hemû tevgerên rizgarixwazen gerdare(gawmî, milliyetî) yê burjuvazi bi ser nediketin u ji alîye herên emperyalîstan dîhatin kuştin u şikandin.


Di hîşyarîyê gîrîyê sosyaliştî ya 1917 an, wêk bi milyona însanan, gelên bîndest ji gawên xwe ji xewastîran vekirîn. Ji na sîyasî ya dînya, ji dere betir renge u candar bû. Wê serketîne u dîmna hîme dewleteke sosyaliştî, merce(şart) objektîf yê dîne dîg- hartin u rîstîka kolodariye ji bînt ve dîhejandin. Bûnaneke mezin ke- tîbî nav sermayedari u kolodariye. Ev serketîna nî, bi serbebe ku tevge- ren gele bîndest yê rizgarixwazen rojhejî, derbazî gîrînekêke nî de u bîbe herêke mezin e dij-emperyalîzme. Loma, ku xurtîya ve herê ji meş ve alî, min di we deme de weha gazi dikir: "Karker u gelên bîndest yê hemû welatan, lewîtin!"

Goreyê 1917 an wêk welatan dîm Hindocîna ji, di bin dest- ra xwe de nîst. Xwende u ronakbîran Hindocîna yê li Ewropa - bed-nedî ramane markîzîme dîbejîrandin. Nemaze piştî Kongra Enternas- yonala Stayan (1922), ku di ve kongre de, loma, hevîna (têz, thèse) xwe ya di derheqa "Gel u welatan bîndest" bîşke xirûbîr bi u bawerîyên beşerî(herîct, beşerî) di nav wân de bi xurtî beja bu, di lewê ji, di demêke di kurt de markîzîst u beşerîyên Hindocîna, hevîna xwe, bi- xurtî di beşdarbûna herê rizgarîya gelên de nîgan dan u le xwêdî der- ketin. Lek ji wân zane u ronakbîran, Nguyen Ai Quoc(ano Ho Chi Minh) bu, ku we gaxe li Fransaya dijya. Ew, yak emîn kes bu, ku bi hîşyarî u zanîstî tevgerîya xêbeteke sazîkî kirîye. Wî, di sala 1922 an de hîme sazîya "Lewîtiya gelên bîndest" danî u dest bi xebatê nîjan kir.

Ho Chi Minh, min ji we gaxe de teşîrîyabû(Femkirîbû), ku ev ketêletê e di dîrejî bîkîne. Wî, cara beşîn dest bi derxistina rojname "Le Partî", ku li diji kolodariye Fransî tedîkosi, kir. Di bin ala ve rojname de, ji bo lewîtiya noma herên dij-emperyalîzme, beşerî, demokrat u sosyaliştî dîxerîbî. Ve xebate, teşîleke mezin li ser namu derbazî çîne bu u li we di gel Vietnamîyên li çîne, sazîya "Lewîtiya Asyayî yê bîndest" u "Lewîtiya Xortên Gerdare yê Vietnamê" pek anî.

ŞOREŞ IM, AZADÎXWAZ IM

Şoreş im, bahoz û mij im
 Pijgîn û gij im, hawir dirijim
 Diteqim, dipeqim, dijmin dikujim
 Pêt im, agir im, xwe ranagirim
 Kuştin û talan, firmêzk û giryan
 Halan û şewat ketim rojhelat
 Diqurijim, dijmin dikujim
 Agir im
 Venamirim, agirê dilê diya
 Dilê sêwiya, dilê hêjara
 Dilê bêzara, dilê birçiya
 Bi pêş ve diçim, diqurijim
 Şoreş im
 Şoreşa Kurd im, bi ah û derd im
 Ew Kurdên gernas, cengawer, mêrxas
 Destên xwe dan hev, xencer û tiving
 Hawir dibazin, bi halan û ceng
 Weke şêr, weke piling
 Dijmin dikujim
 Şoreş im
 Şoreşa Kurdên azadîxwaz im
 Ez şer naxwazim, mafê xwe dixwazim
 Di bin desta de, naxwazim razim
 Hawir dibazim
 Lê çibkim, dijmin dijminê xwînxwar
 Hirç û hov û har
 Doza min nadî carek bi şadî
 Ji serbestî, ji azadî
 Bêbeş im
 Şoreş im
 Di rojhelat de, kevn û dirêj im
 Ji bo parastin, xwîne dirêjim
 Xwedî çiya me, bi şax û kêw im
 Xurt im, navdar im, stûr im, dêw im
 Ne hirç û hov im, ne dîn û gêj im
 Bi pêş ve diçim, gavan davêjim
 Eger bixwazim bikim, ez dişim
 Şoreş im
 Venagerim paş
 Gernas û qelaş
 Navem bindestî
 Koletî, mestî
 Divem serbestî
 Bimre zordestî
 Azadîxwaz im
 Ez şer naxwazim
 Gelek paqij im
 Şoreş im
 Hîmê xwe danî, bi kok û binyad
 Min natirsênî leşkerê Bexdad
 Wek birûsk im, ez bi qîr û tavan
 Hawir dibezim, bi gulebaran
 Ji jor ve tîm xwar, serhişk û dijwar
 Berjêr dikêşim
 Şoreş im
 Xwedî tarîx im
 Kurd im kurçix im
 Mîtan û mad im
 Bi zar û qad im
 Ev heşt sal in ez
 Gerdenazad im
 Ji dijmin re ez
 Welêt bernadim
 Welatparêz im
 Bi gêş û gij im
 Şoreş im
 Tevger û xebat
 Talan û şewat
 Mal û can û ser
 Didim ji bo şer
 Tev didim welat
 Dixwazim felat
 Wek hewr û mij im
 Bi gijgij im, hawir dirijim
 Dijmin dikujim
 Şoreş im



BIJÎ DILSOZIYA ŞERÊ RIZGARIYA KURD YA ÇEKDARÎ !

MERMİ ve BOMBALAR
KÜRT MİLLİ KURTULUŞUNU DURDURAMAZ!..

14 yıldan beri Güney Kürdistan'da devam eden silahlı Kürt Milli Kurtuluş hareketi, Orta Doğunun çocuksal diplomatik oyunlarına karşın, var haşmetiyle devam ediyor. Bu silahlı direniş, faşist Baas yönetiminin bütün gayreti ve vahşetine rağmen, söndürülemedi.

11 Mart 1970 te imzalanan otonomi antlaşması, Kürtlere gerekli milli, sosyal, ekonomik, politik ve askeri haklar tanıyordu. Antlaşmanın gerçekleştirilmesi için ise, 4 yıllık bir müddet tanınıyordu. Fakat bu süre, Kürtlere gerekli hakların verilmesi ve antlaşmanın tatbikine tevcih edilmesi gerekirken, tam tersine Bağdat'ın faşist elit kadrosu, kendisini toplu bir kitle katliamına hazırladı. Bu hazırlık dönemi ile birlikte, Irak eşi görülmemiş politik gelişmelere gebe kaldı. Bir yanda ülkedeki ilerici, demokrat güçler yavaş yavaş tasviye ediliyor, diğer yandan da Kürtlere karşı saldırılarda bulunuyordu. Parti elemanları birer birer suikastlere kurban edilirken, milli direniş hareketinin lideri General Barzaniye karşı yeni yeni ölüm planları tertipleniyordu. Bu planlardan tatbik edilenlerin ikisi de, başarısız kaldı. Birçok parti militanları ve gerillacı yiğitlerin cesetleri güpegündüz faşist kurşunları ile caddelere seriliyordu.

Tarihi yönden ve de yerleşik halkın çoğunluğuna rağmen, Kürtlere ait en önemli şehirler, zorla Kürtlerden boşaltılarak Güneyden getirilen Araplarla dolduruluyordu. Bu Araplaştırma politikası, elbeteki sebepsiz değildi. Bunda güdülen amaç, Kürdistan'ın en can alıcı noktalarına şoven-ırkçı metodlarla Kürtlerden koparmaktı. Bunlardan Ker-kük, Xaneqîn, Şengal ve Mûsil Irak petrollerinin %70 ini üreten bölgelerdi. Kürdistan'ın en zengin yeraltı kaynaklarından sadece biri olan petrol, bir ara İsrail ve Onun batılı emperyalist müttefiklerine karşı Arap yönetimlerince bir silah olarak kullanırken bu silah her zamanki gibi yine de milli kurtuluşunu veren mazlum Kürt halkına karşı kullanılıyordu. Irak Orta Doğunun bu zengin petrol yataklarını özüne mal etmek gayreti uğruna, ilk kez 1972 kışında 100 bin Feylî Kürdünü Irak'tan İran'a kapı dışarı etti. Bu davranış 11 Mart antlaşmasının muhtevasına karşı olmasına rağmen, tatbikinden asla çekinilmedi. Adı geçen kitle, kışın zalimane soğuşunda binlerce çocuğunu kurban verdi.

Yapılması gereken sosyo-ekonomik reformlar, tamamı ile dejenere edilerek uygulanmaya kondu. Bunların en önemlilerinden biri olan toprak reformu, ülkedeki feodal ilişkileri ortadan kaldıracığına, tersine güçlendirmeye yöneldi. Yıllarca dağ başlarında, soğuk sıcağ demeden silahlı elden bırakmadan kendi öz milli-sosyal hakları uğruna çarpışanlar, bir karış topraktan mahrum edilirken, Bağdat, Kuveyt ve Beyrut sefahanelerinde keyif çatan feodal, yarı feodal hükümet taraftarları ölçsüz arazi sahibi ediliyordu. Bu yeniden güçlendirilen feodal tabakalara gerekli imkanlar verilerek, tarım işletmelerinin modernleştirilmesi sağlanarak, karşı devrimcileri mükâfatlandırılıyordu. Böylece, Kürt milli direnişinin özündeki sosyo-politik muhteva değiştirilmek amaçlanıyordu. Oysaki Kürt Devrimi topraksız veya az topraklı köylüleri toprağa kavuşturmak için, binlerce yiğidini bağrında barındırıyordu.

Bütün bu çirkef işlemler devrim adına yapılırken, devrimci sloganlar da Kürt milli devrimine karşı en tesirli silah olarak kullanılıyordu. Başta Kürtler olmak üzere Irak'ın hakiki sahipleri olan emekçiler ve onların öncüleri devrimciler, demokratlar faşist canavarlar kliğince yönetimden mahrum ediliyorlardı. Nitekim bu canavarların çete başı olan zamanın Emniyet Genel Müdürü Nazım Gazar, gidise dayanamiyarak hükümet darbesine girişti. Başarısız darbesi sonunda yakayı ele veren kasap, yargısı sırasında şu sözlerini, kelimeleri tekrar ede ede söyleyecekti.

" - Ben bu gidise artık göz yumamazdım. Zira yalnız ben, sadece bu iki yıl içinde 2 bin Kürdü ve koministi öldürdüm. Daha benden başka bu işlemleri yükümlenen çok kişi vardır. Bir insan olarak bu eşi görülmemiş vahşete, tahammülüm kalmadı artık..."

1963 faşist darbesi yöneticilerinden biri olan Gazar bunca yaptıklarına rağmen hâla kendisini "bir insan olarak" adediyor-

sa, insanlık adına da daha çok cinayetlerin işleneceği muhakkaktır. Zira, Irak'ın politik tarihini azbuçuk bilenler, Gazarın emekçi evlatları, genç kızların bekâretini canice iffal etmesi için hususi yaptırdığı ayakabısını unutmayacaklardır. Hele, onun Kürt devrimcilerini ve Irak'ın gözbebeği FEHAD gibi marksistleri satır ile diri diri nasıl doğradıklarını asla hafızalarından silmeyeceklerdir.

Tarih, faşistlerin halkın evlatlarını bir bir yok etmek için kazdıkları kuyulara, eninde-sonunda, kendilerinin düşüp mahfolduklarını çok iyi yazmaktadır.

Kürt Devrimine karşı komplolar devam ederken, şöven-ırkçı Baasçılar, çağımız devrim hareketlerine musallat olan politik dümen ve oyunlarını en canbaz elemanları ile oynuyordu. Bu giderek, devrimci geçinen devrim düşmanları ile yuvarlak masaya oturup işbirliği yapmaları ile sonuçlandı. Revizyonizmin batağına girtlağına kadar batan halk düşmanları, büyük babalarının da gayreti ile, daha on yıl üzerinden geçmeyen ikinci Endonezya katliamını (Irak komünist katliamı) hiçe sayarak faşist Baasçılarla el ele verdiler. İlerici-Milli cephe adı verilen bu yapmacık cepheye, silahlı Kürt devrim hareketinin öncüsü Kürdistan Demokrat Partisi de davet ediliyordu. Hiçbir köklü değişiklik getirmeyen bu "birlik", Irak halkını açıkça faşist güçlere teslim etmesinden ötürü, KDP bu teslimiyete hayır dedi.

Irak ile Sovyetler Birliği arasında imzalanan 15 yıllık antlaşma, bir yönden Kürt Devrimini pasifize etmeyi amaçladığı ve Irak'ın ekonomik, askeri ve politik alanda tam bağımlılığa yöneldiği söz götürmez bir gerçektir. Başta Mısır olmak üzere, diğer Arap ülkeleri arasında yerini ve prestijini kaybeden Sovyetlerin Arap ülkeleri arasında bir diğer kalesi olan Irak'ı kaybetmemek için bir takım politik oyunlara girişeceği biliniyordu. Irak kamu oyununun en önemli bir kesimini teşkil eden Kürtlerin ve diğer ilerici demokrat güçlerin desteği alınmadan imzalanan bu anlaşma, Kürt otonomisinin gerçekleştirilmesi bânında oldukça karanlık ve istifhamlı noktalar getiriyordu. Ayrıca Sovyetlerin Basra Körfezi'nin en stratejik bölgelerinde oldukça güçlü askeri üslere sahip edilmesi ve de petrolün ucuz fiatla satın alınması imtiyazına sahip kılınması, Irak halklarının yaşamını oldukça etkileyecekti. Enerji krizinin bütün dünyada baş gösterdiği bir dönemde, Kürtlerin rızası hilâfına Kerkük'te varili sekiz dolara alınan Kürdistan petrolleri, yine aynı yerde Batı Almanya'ya 16 dolara satan Sovyetler, kapitalizmin en azgın kâr vuruş istemini karakterize edecekti.

Olup-biten bu olayların yanı sıra, Sovyetler Kürdistanın Mûsil, Hewlêr ve Kerkük şehirlerinde Irak'a satılan zehirli savaş gazlarının depo edilmesine göz yumacaktı. Ama Irak'a satılan en modern bombardıman uçakları, ağır silahlar, zehirli gazlar "Diplomatik" bir dil ile "İsrail'e karşı" ifade edilecekti. Hindistan gibi yıllarca İngiliz emperyalizmine karşı savaştan bir ülke, yine Sovyetlerin "diplomatik" baskıları sonucu, Irak ordusuna mensup onbinlerce askerin Sovyet uzmanlarınca Hindistan'da eğitilmelerine izin verecekti. Onları en modern kışlık elbiseler ve cihazlarla donatacak ve Kürdistan dağlarına gönderecekti. Oysaki bugünkü Hindistan yöneticisinin babası Gandi, zindan hayatında bile Kürt Milli kurtuluşunu canıgönülünden desteklemişti.

1973 sonbaharında faşizmin koalisyon ortakları revizyonist sapmacılar, ağababalarının silahlandırılarak Kürt devrimine saldırıldı. Kürdistan'da yaptıkları sabotaj ve kışkırtma hareketleri, her iki tarafın da IO-u aşkın can kaybı vermesine yol açtı. Bu silahlı kışkırtma hareketinin, tüm Irak'ta kuşku ile karşılanması, giderek revizyonist dama taşları cüceler arasında bölünmelere sebep oldu. Böylece birbirine düşen eli kanlı cellat ortakları, kendi partili elemanlarını birer birer ispiyon etmeğe başladılar. Bütün bu provokasyon hareketleri, yüzlerce anti-koalisyoncu partilinin başını yemekten geri kalmadı. "Casir el-Nihaye" (sonsuz saray) bir yandan canlılarla doldurulurken, bir yandan da, ölü cesetlerinden boşaltılıyordu.

Soyguncu revizyonistler, dünya kamu oyunu oynanan oyunlardan bihaber kılmak ve yanıltmak için, var güçleri ile yalan ve tezvir makinasını işletmeğe koyuldular. Amaç, kendi silahlı provokasyonlarını ve faşist Baas yönetimini haklı ve temize çıkartmanın yanı sıra,

Kürt devrimini, dünya milli kurtuluş hareketleri ve ilerici, devrimci dünyadan tamamı ile izole etmekte. Nitekim onlar, bu eylem ve arzularında tamı-tamına başarıya ulaştılar. Dış dünyaya, Kürt devrimi, gerici-feodal ve emperyalizmle taban tabana çakışık bir hareket olarak tanı-tıldı.

1974 başlangıçlarında, faşistler koalisyonu 11 Mart Antlaşmasına taban-tabana zıt yeni bir "Otonomi Planı"nı, Kürtlere, ultimatom karşılığı sundu. Bu sınırlı otonomiyi kabul etmeyen Kürtler, antlaşma çabalarının boşa çıkması üzerine, yeniden silaha sarıldılar. "Savaştan bir ay içinde muzaffer çıkacağını" iddia eden caniler, ancak bir yıl sonra, diplomatik(!) namusuzlukları ile muzaffer oldular.

Kürdistan'ın jeopolitik ve dünya siyasi konjoktürü içindeki çetrefiliği, en başta onun iki emperyalist devin sosyal, politik, askeri ve ekonomik arenası içinde bölüşülmesi, Kürt devriminin kıs-kıvrak çembere alınmasını kolaylaştırmaktadır. Bu nedenledir ki, Kürt milli kurtuluş hareketi, günümüze değin, siyasi alanda oldukça başarısız kalmaktadır. Böylece Kürt milli direniş hareketleri, dünya siyasi konjoktürü içinde, özellikle illerici, devrimci dünyada kendisine bir can-kurtaran simidi bulamamaktadır. Diğer yandan, Kürdistanı kendi aralarında paylaşan kukla gerici-faşist devletler, Kürt halkının silahlı direnişini kırmak için ellerinden gelen yüzsüzlükleri yapmaktan içtinap etmemektedirler. En ufak bir kıpırdayısta, ya hep beraber hareketin üzerine çullanmakta yahutta birbirlerine çiftlik bağışlar gibi toprak peşkeş etmekte, eski anlaşmazlıkları karalayarak yeniden tesanütü sağlamaktadırlar. Bunun en bariz ve çiçeği burnunda misalini, son aylarda Güney Kürdistan'ın başına örülen çorapta görüyoruz.

Dünyanın en büyük süper devleti olarak bilinen Sovyetler Birliği, gerici-faşist Şah ve Irak yönetimlerine, Amerika ile birlikte en ağır baskı metodlarını uygulayarak, her iki ülkenin bir an önce antlaşmaları için gerekli senaryoyu hazırladı. "Sosyalizm"(!) adına drije denilen bu trajik-dramın oynanması için, sahne olarak Cezayir seçildi. Kısa bir zamanda her iki ülkenin kodamanları, açık artırma için, orada buluştular.

Evet, ne acıdır ki, her iki elin parmakları sayısı kadar yılları bulan uzun ve sabırlı, günün milli kurtuluş savaşı sonucunu bugünün Cezayiri, Orta-Doğu'nun en büyük 3 halkın ölümsüz şehitleri diyarında, müzayedesine evet diyecekti. Başta kendi halkına ve ülkesine ihanet eden Cezayirli(!) Bumediye'nin, yuvarlak masada Kürt, Arap ve Fars halklarını topyekün satış için, elinden gelen en adi cambazlığı yaptı. Sonuç olarak, Kürt ve Dohfar-Oman silahlı milli direnişleri, emperyalist süper devletlere satıldı. 6 Mart 1975 günü, bu halkların kurtuluş savaşlarında halk düşmanı hain Bumediye'nin, emperyalizmin çirkef çıkarlarını korumak için, Kürt, Arap ve Fars halklarını yüzsüzce satığı gündür.

Ahım-Şahım ve şatafatla imzalanan, halkları alım-satım antlaşmasınının 3. ve 4. maddeleri gereği, İran; Kürtlere, bir diğer maddeye göre de Irak; Dohfar-Oman'a askeri yardımlarını kesmekte idiler. Ayrıca bu antlaşmaya göre, İran-İrak sınırları dünya haritasında çar-çabuk değiştirilerek, Şat-ül-Arap (şimdiki Şat-ül-Amerika), İran diktatörlüğüne mükâfat babından bağışlanıyordu. Keza antlaşma, her iki süper devletin Orta-Doğu'daki emperyalist çıkarlarını garanti altına alarak, mazlum halkların kanı pahasına, dünyayı kendi aralarında bölüşüyorlardı.

Bütün bu olup-bitenlerin yanı sıra, İran askeri birlikleri Güney Kürdistan'a girerek, ellerine geçirdikleri erzak ve cephaneyi İran'a taşıdı. Bir anda etrafı çevrilen Kürt yöneticiler, şaşkına dönerek, savaşıma güçlerini kaybettiler. Çareyi ise, Irak'a teslim olmaksızın, İran'a sığınmakta buldular. Böylece, yakın tarihin kaydedeceği en büyük hatayı yıkılan moral ve ümit neticesi işlediler.

HERNEKADAR SİLAHLI DİRENİŞE GEÇİCİ OLARAK ARA VERİLMİŞ İSE DE, KÜRT HALKININ ÜMİDİ VE DE TEK KURTULUŞ YOLU, DAĞ VE SİLAHLARINDADIR...

Not: Yukarıdaki makale ile ilgili dökümanlar ve bahisler, dergimizin her sayısında, uzun uzadıya işlenecektir.

nivîsevan Eliyê Evdîrehman

Têbînî: Kurdiya vê romanê, ji aliyê me hatiye rastkirin.

birs yekan

WARÊ ÇOLO Û ŞER

Lûtke û pozê çiyayê Araratê û berpâlên wê hîn ji xewa zivistanê ranebûn. Wê kirasê spî yê berfîn bi xwe alandibû, ku nece-mide. Lê bintara wê, ji ber germê bihujibû û xal ketibûnê. Avên ku ji belekiyê dihatin, tev hev dibûn û mîna maran çiv didane xwe. Wan di gel hewa sur, bi şewat distiran û tevî ava kanî û çavkaniyan ber bi jêr diherikin. Wan di nav gelî û gobazan de, bêxwedî û wek Kurdên ji bextê xwe gazinker, bi kevîr û kuçikan re ceng dikir. Çar çaran Jî Ji coya xwe derdiket û hêrs dibû. Wê dizanibû, bêî ku însan wê bi kar-tînin û jê karê dikin, badilhewa û bêxêr diherike. Nemaze li a-lyê jêrê, avine wek xwîna mirovên aware û bêkêr diketin nav çem û leza wê kêm dikirin. Ew çem digiryan û bi kefa xwe ya bi qerqas ve çavên xwe paqij dikir û dîsan hêrs dibû dikete cengê û ber bi jêr dikişiya. Dema ku ew digiha maka xwe ya Êrez, gilî û gazine wê zûlmê bi dê dikir û paşe dîsan dest bi rêwitiya xwe ya hertimî dikir. Dikişiya û diherikî...

Eger ziman têteta devê wan çem, newal û kevîran, dê wek kalên zemana rûniştana, civatine li dor xwe kom bikirana, bi meh û salan di derheqa zulim û sîtema Roma reş ya ku gelê Kurd perçiqandiye de, bi-peyivana. Lê deka ku mirov bi dilsozî û dilpakû li wan bedewtiyên çiyayê Araratê binhêre ê xweş xuya bibe ku ew çiqasî ji bo Kurdan hatiye birîndarkirin û rojên dijwar derbaz kiriye. Wî bi hezaran mê-xas di paxila xwe de xwedikiriye, keys û rê daye, ku ew li hember dij-minên vegirker şer bikin û li ber xwe bidin.

Sîtem û zulma vegirkeran, di nivê havîneke germ de, destên Kurdistanê vegirtibû. Bajarên Kurdan wek Wan, Bazîd, Îdir, Êrdîs û hp. di nav şîneke giran de bûn. Penc û tirêjên tavê yên zêrîn jî, ne-mîna salên derbazbûyî geşbûn. Mirov bi ku de biçûya şîr û girî, ma-lên mîrate, derên dadayî, birîndar, xela, nexweşî, tazîbûn, talan û ta-yan li ber çavan bûn. Vegirkerên Roma reş bûbûn ruhîstîn, das û kê-lindiyên jehrîn heldabûn destên xwe û bêî ku heyfa xwe bi piçûk û me-zînan binîn, wek pincarê Kurd xeza dikirin. Dengên dayîk û bûkan, qîzên dest bi hene û zarokan, kal û pîran mîna refê qulingên biharê di nav hewê de perwaz didan. Qîrîn û dengên wan bûbû perdeke reş û riwê erd û ezmên vegirtibû. Ji derd û kulan, dinaliyan û hawar di-kirin.

Ji ber vê yekê bû, ku êlên Kurd yên Banokan, Hêcimkan û Qir-miskan ji zorkeriya Romê ya sala 1920 an revîn û hatin ba êla Şi-kakan. Dîroka eşîreta Şikakan gelekî kevn e. Wan çendî çend salan ji bo azadî û serbestiya xwe li hember vegirker û sîtemkarên Romê û Îranê şer kirine û tu xerc û xerac jî nedane herdu dewletên xwîn-xwar. Wan ew ji tiştê nehejmartine û li ser tixûbê (sînorê) herdu dewletan de xwe bi war kirine û li wê jîne.

Êlên Banokan, Hêcimkan û Qirmiskan li ba eşîreta Şikakan jî gelekî neman. Halê wê êlê jî ne tu hal bû. Jîn li wê pir dijwar bû. Giregirên hersê êlan biryar (qîrar) dan, ku ber bi Îranê herin da ku li wê cîhekî bi xêr û bêr bibînin û serê sêwî û dilên xwe xwedî bikin.

Serdarê hersê êlan Çoloyê Têmûr dihatê hejmartin. Ew kesekî ciwan î sih û heft salî bû. Lê çawa ku dibêjin haya (ageha) wî ji ba-yê dinê hebû, wî di wî temenî (emrî) de pir tehl û tengasî ditibûn.

Pir caran ew ketibû girtîgeh û zîndanên û gelek caran jî jê revîbû. Wî bi salan revokti (fîrartî) kiribû, gelekî alîkarî dabû belengaz û tengezaran. Civatê jî wî hez dikir û wî jî ji wan. Ji lewre nav û dengê Çolo di nav Kurdên Romê û Iranê de bi mirovperwerî û mêrxasî belabû. Ew jî bejnê ve navçe (orte), navmil pehn, por kurîşkî, simbel reş û polik bû. Diranên wî yê sedefî reş û reng didan devê wî. Lê çaxa wî rexta (haleta) xwe çep û rast girê dida, tiving davête milê xwe, xencer dixiste ber şûtika xwe, qirma xwe dida piştî xwe û li hespê zarçal siwar dibû, mirov hewaskarê dêmena wî dibû, ku mêze bike.

Li ser daxwaza hersê êlan û giregirên wan, Çolo û du rîspî diçin ba Riza Efendî li bajarê Xoyê. Jê pir hevî dikin ku ew hersê êlan bihewîne warê xwe. Piştî gelek xir û ciran, Riza Efendî razî dibê. Lê çend merc û şertan datîne pêşiya qasidê êlan. Divê serê malê pezekî bidin û bihar, havîn, payîz û zivistanê keriyên pezi, garanên dêwêr û revoyê hespên wî, li warî bin. Herweha divê karê erdî bikin. Qasî hindê jî qasidê hersê êlan bi van mercên Riza Efendî qayil dibin. Ji ber ku war li ciyekî gelekî baş û bêdar de bû. Çawa ku dibêjin piyekî wî li ser arane û e din jî li ser zozanan bû.

Çolo, her fen û fêlê axa û begên zulmkar û xwînmêj ji zû ve dizanibû. Wî baweriya xwe bi Riza Efendî nedani. Herdu alî mercên xwe li ser kaxezekê rêz dikin, binî dinivîsin û li ba qaziyê Xoyê didin morkirin. Riza Efendî wê reşbelekê nade Çolo, li ba xwe dihê. Lê dide wan êlên Kurdan ku werin warê xwe û piştî ku hesabê xwe ji wan bistîne, reşbelekê li Çolo vegerîne.

Bihar bû. Tavê wek reşsa xwe bide der, germa dabû ser bedewbûna tebiyetê. Çolo û giregirên hersê êlan destûra xwe ji eşîreta Şikakan û mezinên wan xwestin, koçê xwe barkirin û berê xwe dan warê Riza Efendî. Roja pêncan koçên hersê êlan gihane warî, di beyarê kêleka warê Riza Efendî de danin, konên xwe vegirtin û li bendê man. Çend rojan bi şunde Riza Efendî bi birek seyîşên xwe ve hat. Li gor tore û edetê, Çolo bi çend peyayên xwe ve çûn pêşiya wî. Li kêf û halê hevdû pirsîn, Riza Efendî bi seyîşên xwe ve ji hespan daketin û ber bi mala Çolo çûn û wî jî qedir û rêzdariya wan girt. Riza Efendî, ji bo heqê warê xwe 1500 pez stand, Paşê reşbelek da Çolo, xatirê xwe ji wan xwest û di san vegerî Xoyê.

Piştî çuyîna Riza Efendî, hersê êl, li rasta pêşberî mala Çolo civiyan hev. Ew bi dîr û dirêjahî bi hev şewirîn û biryar dan, ku ji sibehî pê ve dest bi çekirina xaniyan bikin. Her yekî hefta dirûna ceh û genim, ji xwe re koş û kizoxek ava kir. Ji wê rojê pê ve xelkê wan êlan, navê wir "Warê Çolo" danin. Gundên li der û doran jî, ew war bi vî navî nas dikirin.

Hersal havînê, xort û mîrên navsere diçûne deştê. Hin ji wan genim didirûn, hinekan jî xebatine din dikirin û payîza dereng, dahatên xwe dianîn malên xwe. Çawa ku serê sibehê tûrên xwe davêtin stiwê xwe, pêberjêr, ber bi gundê Arane diçûn, ji xwe re li ser ryan û di nav zeviyên çini de, simbilê ceh û genim kom dikirin û danê êvarê vedigerîn gundê xwe. Çuyîna heroj pir kal, pîr û zaro ji hal dixistin, nexweş diketin. Rûniştvanên warê Çolo, di vê zekûlî û tengezariyê de, çend salan xwe bi wî celebî xwedî kirin. Lê way li wê xwedîkirinê!...

Riza Efendî jî bûbû gur û agir, bûbû bela serê xelkê warî. Wî bi destê serbajarê Xoyê, ji bo ne tu tiştî, çend mîrên êlê dabû girtin û di zîndanên vegirkeran de dabûn eşandin û xezakirin. Ew ketibû dû Çolo jî, lê Çolo keysa girtinê nedida wî. Bav û kalên Kurdan ji berê de gotine; "Striwê nanê genimî heye". Bi rastî jî striwê nanê genimî, te e bigota, zikê Riza Efendî qul dikir. Wî ji xêncî xwe, kesek bi tiştêkî ne dihejmart. Ji ber ku kara çil gundê Kurdan dikete kîsê wî. Ew carna li ber karbidestên bajarê Xoyê dikete cengê û digot: "Ez tenê Şahê Iranê nas dikim". Lê dema ku karbidestên bajêr enîşka xwe nîşan didan, Riza Efendî, bi hezaran zêr dimezaxtin, da ku navbera xwe û wan bide sazîkirinê. Di dawiyê de ew di san digiha armanca xwe.

Rûniştvanên Xoyê ku Kurd, Faris û Azarbeycanî bûn, ne diwê-
rîbûn li ba riza bipeyivim. Anç gotineke wî li ba wan nedibû dido.
Lê belê ew jî Çolo û civata wî ditirsiya, bi her awayî dixwest çavên
wan bide tirsandin, ku wan bi temami têxe bin destên xwe. Heke
ev jî nebe, bi awakî Çolo jî nav bide hildan. Lê qasî hindê jî, êla
Çolo, serê xwe li ber wî xar nedikir û herdem bi wî re dikete şer
û şeqê.

Demsal bihar bû, bedewbûn û geşiya tebîetê bi mirov re şa
dibû, rû û rûçikên xwe bi mirovî nîşan dida. Riza Efendî, bi birek
seyisên xwe ve, bi kelobîni hespên xwe ber bi warê Çolo dibezandin.
Rengê wî reş-xitimî bû. Ew car caran paş de difitilî, li siwarên dû
xwe mêze dikir, serê xwe çend caran bi vir û wir de dibir-dianî û
bê hemdî xwe qamçî li hespê xwe dixist. Ji nişkê ve jî ber lingên
hespê wî kêwroşkek rabû. Wî ferman da seyisên xwe ku wê kêwroşkê
bigrin. Her yekî anegorî hespê xwe da dû wê. Siwaran çend caran dor
li wê girtin, lê wê xwe di nav wan re dikir û direvî. Dawî ew birîndar
kirin û girtin. Piştewanekî Efendî ew avîte nav xwe û qayîşa zî-
nê û ber bi Riza Efendî hatin. Efendî bi girtina vê nêçîrê gelekî
şa bû, lê hinekî jî posîde û şermezar bû, ku hewqas siwaran dabûn dû
kêwroşkekê, heta ew birîndar nekirin nikaribûn bigirtana. Piştî xê-
lekê Riza Efendî bi seyisên xwe ve, li ser kaniyekê ji hespan dadî-
kevin, seyisên wî laşê kêwroşka belengaz a bêgune, davêjin ber kani-
yê û li benda fermana Efendî radiwestin. Riza, çend caran seyisên
xwe ber çavên xwe derbaz kir û bi riwekî tirs, weha got;

—Ew nanê ku ez didime we, li we heram û postê berêz (xinzîr)
be. Hun bîst siwar bûn, ku dû vê nêçîrê ketin, we ew bi saxî negirt.
Heta we ew birîndar nekir, we nikaribû bigirta. Hun koma ser tasê ne.
Ji xêncî nan û xwarinê, hun ne dermanê tiştêkî ne. Nanê min li we he-
ram be. We bi xwe dît ku min çî anî serê bajargerê Xoyê. Wî yek got,
min sed. Min ew bi tiştêkî nehejmart û nehejmêrim jî. Wî, ez bi girtin
didam tirsandin. Lê tu were vî Çolo'yê ha, yê ku li ser xwe nasekine
binhêre. Wî gundî hemû kirine agir û berî laşê min daye. Tu şerm û
fedî di riwê wan de tune. Hun jî dizanin, ku min heta niha çendî çend
mêr ji wan dan girtinê û di zindanan de xezakirin. Lê dîsan jî bi a-
qil nebûn û nehatin ser rê. Derdê mi Çolo ye, Çolo!.. Eger ez bikarim
Çolo gem bikim, yên mayîn dibin cûcûk û mirîşkên min. Ez qûtê di kî-
jan alî de bavêjim, ê di wî alî de herin. Qewîtiya min li we ew e, ku
ezê îro bi navê bajargerê Xoyê bi wî re bipeyivim, ku qaşo wî banî
Çolo kiriye. Heke wî nepejirand (qebûl nekir) ez ê bersiva (cewaba)
wî bidim...

Xortekî hejde-nozde salî, î di nav seyisan de, li ber xwe ne-
da, li Efendî temaşê kir û got:

—Ez benî, civata Çolo ne wek xelkê sernerm e, ew tu caran des-
tevala nagerin. Herdem di ber qayîşa her yekî de, şaşarek (hacet, deban-
ce) heye. A didwa jî, ev çend car in, dema em tînen warî, wek hevdu aga-
darkirin çarsed-pêncsed mêr derdikevin pêşiya me. Em li hember hinde
kesan çî dikarin bêjin. Îca, bi xwedê, eger em guleyekî bavêjin, dê Kurdên
koçer me per û perişan bikin.

—Tu jî mîna Çolo ji yên kuştinê yî. Lê heyf, ev ne ew cîh e.
Ez ê li Xoyê bi te re bipeyivim.

Riza Efendî bi hêrs gotina xwe weha domand;

—Ez dispêrime we. Îro divê em Çolo binin rê. Ew gedê (zaroyê)
dûh na pêr, îsal hemû gundî hînkiriye, ku qaşo xerc (bêç) zehf e, divê
bête kêmkirin. Hay lolo... Ma ev yeka ha ya pejirandinê ye, ku ez bi-
pejirînim? Min gund firotiye wî. Ji xwe Şah jî xerc û xerac li wî
neboriye û nebexişandîye. De, rabin siwarbin!

Piştî demekê, Riza Efendî di gel seyisên xwe siwar bûn, di ge-
lî û gebozan re derbaz bûn. Bi fermana Efendî, ew berê çûn nav mala
dewlemendê wir û paşê çûn warî. Ew li meydana daketin, ban Çolo kirin.
Wek berê, niha jî dused-sêsed mêrî, xwe li dor Efendî civandin. Cara

pêşîn, Efendî, bi zimanekî nazik û şirîn silav li Çolo û civata wî kir. Lê belê, xortên gund dor li seyîsên Efendî girtibûn. Li ba her seyîsekî bi kêmanî çar-pênc mêrên çekdar (bi sîleh) rawestîbûn. Ew hemû li benda bilindkirina destên wan bûn. Riza Efendî dît, ku bi zorê tiştêk dernakeve. Lewre, weha got;

—Çolo, birayê min! Min ev war firotiye te. Lê Şah xerc û xerac li civatê nebexişandiye. Rojê danekî bajargerê Xoyê doza peran li min dîke. Tu jî rê nadi xelkê, ku ew xercê (bêcê) dewletê bidin. Ez nizamim, çî bersivê bidime wî. Ji xwe perê min tune û min pere neçandiye, ku ez ji alîkî ve kom bikim û ji alîkî ve jî dewsa (şûna) we bidim dewletê. Ne, weha nabe. Em Kurd hemû birayên hev in. Em divê rêzdarî û qedrê hevdu bigrin. Wisa mekin, ku ji bona we serê min bi dewletê re têkeve belê. Aaa... xortên me hemî şahid in, ku serbajariê duhî çî anî serê min. Bi serê te, hindik mabû ku min bide girtinê, bavêje girtîgeh û zîndana xwe. Lê min, ew bi awakî xapand û ji destê wî rizgar bûm. Geli birano êdî weha nabe. Bêc û xerça dîwanê divê di rojê de bête dayîn. Eger bawer nakî, tu û çend siwarên xwe li hespan siwarbin, em tev herin ba wî kafirî. Bi xwedê û bi qurân, ez jî dixwazim alîkariyê bidim we. De, birano hun êdî çî ji min dixwazin?

Paş axaftina Riza Efendî, Çolo û rîspiyên dinyadîtî serwext bûn, Çolo li wî vegerand;

—Eger qançora min tenê bûya, min ê vê gavê ew bida. Lê ez çî dikarim bikim. Ji ber ku rewşa xelkê ne baş e, nikarin hewqas xerc û xeracê niha bidin. A didwan jî, keys û dema min tune, ku ez bi te re werim Xoyê. Baştir e ku tu li ber me tev wî bipeyivî û rewşa me jê re bêjî. Dibe ku ew bi saya serê te li me were rehmê.

Dema ku Çolo wilo digot, hêrsa Riza Efendî dihat, dest û lepên wî dihejiyan. Bêî hemdê wî, destê wî ber bi mawîzerê diçû, lê cesaret nedikir. Wî, tenê li seyîsên xwe dinhêrî. Te ê bigota, qey seyîsan ew qewil û mercên ku berî çar-pênc saetan dabûn hev, bi temamî ji birkirine. Di dawî de, Riza Efendî xwe negirt û pir bi hêrs şer da ber Çolo û civatê. Lê wan jî bersiva pêdivî (lazim) ji wî vegerandin. Kêdikeke din Çolo geleki bi hêrs ket û got;

—Riza Efendî, mala te neşewite, çima tu bi me re weha tehl û tûj î? Tawan û gunehê me çî ye? Min yan jî kîjan xortî, ev çend sal in rêzdarî û qedrê te negirtiye? Yan jî me kîjan merc û qewl ne anîye çîh? Em jî li gor xwe mêr in. Rûmet û navdariya me jî, kê-m-zêde di nav eşîretan de heye. Me meke xwelî (ax) û di ser me re derbaz nebe! Ne axir herkes kure bavê xwe ye. Ev çend carin ku tu me ji bo tiştêkî hiç û pûç, bê ar û rezîl dikî. Rêzdarî û qedrê rîspiyên me nagirî, di nav jin û zarokan de çî bêt devê te tu ji wan re dibêjî. Ne axir namûs û rûmeta her kesî li wan şirîn e. Kurd dibêjin, "namûs avêtin kûçikan, kûçikan jî qebûl nekir". Tu bi xwe dibînî, ku me heta niha ji te re tiştêk negotiye û bersiva te jî bi tehl û tûjî nedaye. Ji ber vê yekê jî, divê tu têbighêyî û serwext bî, ku em Kurd in. Ji vir û ha de, tu çî bîreşîni tu ê wî jî helgirî. Ji îro pê ve aqilê xwe komî serê xwe bike. Çawa pêdivî be, bi me re wisan bipeyive. Tu, bi wî devbelayî û belaxwaziya xwe ve, tu caran naghêjî kam û mirada xwe. Her tişt, bi aştî, di reya heqî û mafî de rind e. De wekî din tu dizanî. Li kêfa xwe binhere!...

Dûmahîk heye

Geli Kurdan!

Eger hun naxwazin ji hev taromar û winda bibin,
berî her tiştî, zimanê xwe bixwînin û bidin xwendin.

Lê eger dixwazin xwe nas bikin û xwe bidin
nas kirin û hez kirin, û bi hevaltî û dostaniya milletên
din re pêş ve herin, û bi rûmet û serbilind bijîn, dîsa
zimanê xwe bixwînin û bidin xwendin. Dr. N. Zaza



Yekê Gulanê, yek ji rojên rabûn û desthilanîn û nîşana hişyarbûna karkêran ya li dijî sermayedariya xwînmêj û zordest e. Ev roj, dûrişma mîldariya navgeli (beynelmînelî) ya kedkar û zehmetkêşan e.

Dawiya sedsala 18 an, çaxa alozbûna aboriya sermayedariya emerîkî, ku ketibû tengav û bûhraneke mezin û li ber candanê bû. Bêaramiya (bêhîzûrî) siyasî û şerên navxweyî welêt, bejin dabûn.

Şerên dûr û dirêj yê navxweyî, ku di navbera axayên başûrî yê ku dixwestin reşikan (zencî) bikin kole û xwediyên sanayî yê bakurî yê ku dixwestin reşikan "azad bikin" û di febrîqeyan de wek karker bidin xebatê, dawî hatin. Lê dirêjbûna şer, derbeke giran li aboriya welêt dabû. Aboriya şer, candariya ku mezaxtinê (serfkirintûketim) dabû dahatê (întac, produksiyon), dawî anîbû. Îstîqrara siyasî, hîn cîhê xwe negirtibû. Sermayedariya sanayî, di qonax û gehîneka derbazbûna emperyalîstiyê de bû. Van monopolên ha, yê ku hîn ji xwe re li derveyî welêt, cîhek nedîtibûn, hebûn û domdariya xwe, bi erzantirîn destmiz û ked ve girêdabûn. Erzantî û xwînmêjiya kedê ya bi hovî, di nav refên kedkaran de bêaramiyeke mezin peyda kiribû.

Ji ber vê yekê jî, hîn di sala 1874 an de, li çend ciyên Emerîkayê, karkêran li dijî "keda erzan û xebata dirêj" desthilanîn. Lê rabûna karkêran ya mezintir di 1-ê gulana 1886 an de bû. Bi hezaran karkêr, ji bo "rojê 8 saet karkirinê" dest bi karberdanê (çev) kirin. Lê, burjuwaziyê mezin, li Şikagoyê, careke din diranên xwe yê qîlkirî tûj kirin û bi karkêran nîşan da. Xwîna karkêran seqamên (cadde) Şikagoyê avdan û di kargehên Cormick-Harvester de bûn gol.

Kongra Parîs, ya ku bi destê Engels pêkhatibû (14-21. 07. 1889), berî ku biqede, li rojekê digeriyan da ku wê rojê yekîtiyê û mildariya navgeli ya karkêran qebûl bikin. Herweha ev roj, li hemû cîhanê, rabûna karkêran ji bo mafên demokratîk û aborî bête naskirin û cêjin kirin. Ji bo vê jî, Kongra Parîsê pêşneyarên nînerê frensî Lavigne ku yekê meha gulane pêşneyar dikir, pejirand. Ji xencî vê kongrê, maene û girîngiya yekê gulane, di kongra Enternasyonala Didwan ya sala 1893 an li Zûrichê, ku 392 nîner beşdar bûbûn de, hîn xurtir û bi nav û dengtir bû. Di vê kongrê de, ev biryara jêrîn bi hemû dangan ve hat wergirtin.

"Karkêrên hemû welatên cîhanê divên bi hev re danezaneke dijwar û xurt amade bikin. Li her cîhî wê di eynî rojê de bidin karbidestên welatên xwe û ji wan doza rojê tenê 8 saet karkirinê bikin..."

Ev bûn 86 sal, ku her sal yekê gulane karkêrên cîhanê cêjin digrin, hişyarbûn û xwestekên xwe yê li dijî sermayedariya xwînmêj tûj û nûjen dikin.

Wek li hemû welatên faşîst, îro li Tirkiyê jî maena yekê gulane tê înkâr kirin. Heta îro li Tirkiyê, yekê gulane wek "cêjna biharê" tê qebûl kirin. Bi vê ve, Tirkên faşîst dixwazin ku hêza karkêr û kedkarên Tirkiyê, ji hêzê karkêrên cîhanê û têkoşîna wan a siyasî û aborî bicemidînin.

Yek ji xwestekên sermayedarên Tirkiyê jî ev e, ku bi karibin kedkarên Tirkiyê di bin çavdêrî û destên xwe de bihêlin, da ku xwîna wan zêdetir bimêjin. Lê belê, ev pariyê ha, yê ku heta niha bi rihetî dikeve devê wan û di qirika wan de bimîne. Hesabê çewt (xelet) ê rojekê bi yekîtiya Kurd, Tirk û gelên din yê Tirkiyê ji nivê reya Bexdê bête veşerandin...

RABÛN'U OKU ve OKUT !

Nr.01— Dîwana yekan, Cegerxwîn

Dîwana pêşîn ya helbestvanê navdar Cegerxwîn e. Di vê afirandina xwe de hozan Cegerxwîn, dereca bikaranîna humermendiya helbestvaniya xwe pir bi helezî nîşan dide. Meane û bedewbûna helbestên wî yê civakî, gelêr, evînî xwe di vê pirtûkê da eşkere dikin. 178 rûpel, bi kurdî, 10 DM.

it is the first poetry collection by the famous Kurdish poet Cegerxwîn. In this collection, the poet displays his great talent. The meaning and brightness of these national, social and love poems are treated. 178 pages, in Kurdish, 10 DM.

Nr.02— Kurdistan and the national liberation struggle of the Kurds

Di vê pirtûkokê de, enformasyonên kurt û girîng li ser xebat û dîroka têkoşîna gelê Kurd di rojhelata navîn de tên berpêş kirin. 40 rûpel, bi îngilîzî, 2 DM.

In this book there are important facts about the Kurds history and the development of their national liberation in the Middle East. 40 pages, in English, 2 DM.

Nr.03— Barbarizm — hovîtiya Beesiyên Îraqê — vahşet

Ev pirtûkoka ha, ya bi pir zimanî, ji hovîtî û dirbûna Beesiyên Îraqê re meşqeke helez e. Bi wê ve, dê bête zanîn, ku Beesî çiqasî çavsor û gelkuj in. 60 rûpel, bi îngilîzî, firensî, elmanî, kurdî, swêdî, tirkî, 1 DM.

This booklet gives an example of the barbarism and torture of the Iraqi Baath regime. It shows us what kind people they are. 60 pages, includes English, French, German, Kurdish, Swedish, 1 DM.

Nr.04— Sen faşist savcı iyi dinle! — dünyada Kürt vardır, DDKO'nun savunması

Ev pirtûka ha, liberxwedana hevalên DDKO, yê ku bi destên cûnta leşkerî û faşist li Tirkîyê hatibûn girtinê, ye. Tê de rewşa Tirkîyê û Kurdistanê Bakur bi tevayî ji hev tên derxistin. Ew bi gernasî pirsar gelê Kurd, ya ji bo azadî û serfiraziyê bi me didin zanînê. 244 rûpel, bi tirkî, 10 DM.

This book concens the defence speech of the members of DDKO (The Revolutionary Cultural Organisation for the East of Turkey) the court of the Turkish, fascist military junta. In the book there is an analysis of the situation in Turkey and the north of Kurdistan. It tells us about the Kurdish question of liberation and its situation. 244 pages, in Turkish, 10 DM.

Nr.05— İsmail Beşikçi ve bazı Kürt köylülerinin idianameleri

Ev pirtûka ha, sebêbên girtina zane, ronakbîrê sosyalîst ê heja yê Tirk Doçent İsmail Beşikçi û hin kurdan bi me dide diyarkirin. Kek Beşikçi, yekemîn lawekî zane î gelê Tirk e, ku bi hemî karî û şîyanên xwe ve, ji şoreşvanî û rûmetdariyê re baştirîn meşq e. 102 rûpel, bi tirkî, 5 DM.

This book informs us about the apprehension and the indictments of the Turkish intellectual and socialist, Docent İsmil Besikçi and some Kurds. Comrade Beşikçi, who is the first son of the Turkish people, is a good example of the revolutionary brotherhood and their goals. 102 pages, in Turkish, 5 DM.

Nr.06 - Kurdistan och kurdernas nationella befrielsekamp

Di vê pirtûkokê de, enformasyonên kurd û girîng li ser xebat û dîroka têkoşîna gelê Kurd di rojhelata navîn de tîn berpêş kirin. 30 rûpel, bi swêdî, 2 DM.

se nr.2

Nr.07 - Destana Memê Alan. Dr.N. Zaza

Ev destana ha, yek ji bedewtirîn meywe û dahata çanda kurdî ya gelêr e. Nemaze pêşgotina wê, ku Dr.N.Zaza ni-vîsandiye, giranbihabûn û meana Destanê hîn mezintir û girantir dike. Di dîroka bêjeya (edebiyata) kurdî de, yekemîn çar e ku afirandinên gelêr, weha bi zelalî û siyasî ji hev tîn derxistin. Ew ji bo refa pirtûkan, nişaneke zêrîn e. 188 rûpel, bi kurdî, 10 DM.

This episode is one of the most tasteful and valuable products of the rich national culture of the Kurds. The preface, written by Dr.N.Zaza, particularly enhances its meaning and value. It is the first time in Kurdish literary history, that the Kurdish national works are analysed in a political and philosophical way. 188 pages, in Kurdish, 10 DM.

Ji bilî van pirtûkên jorîn, çend sêlik (5 DM) û afîşên me jî hene.

Besides these books, we have records (5 DM) and posters.

Yukarıda sıralanan kitaplardan başka plak (5 DM) ve afişlerimiz de vardır.

YÊN KU ÇAPDIBIN - YAKINDA ÇIKACAKLAR

Romanên Serpêhatî;

DIMDIM , Erebe Semo
BERHEVOK , Erebe Semo, 3Berg(cild), 1+Berbang, 2+Jîna Bextewar, 3+Hopo
HEWARÎ , Heciyê Cindî
GUNDÊ MÊRXASAN , Eliyê Evdîrehman

Helbest û Dîwan ;

WELAT û HEZKIRIN , Wezîrê Nadir
ŞÊXÊ SENHANIYAN , Feqiyê Teyran

DÎROKA PARTÎ DEMOKRATÎ KURDISTANA ÎRAQÊ

IRAK KÜRDİSTAN DEMOKRAT PARTİSİ TARİHİ
KÜRT MİLLET HAREKETLERİ ve IRAK'TA KÜRDİSTAN İHTİLALİ , S.A.Şivan
KÜRT MİLLİ HAREKETİ TARİHİ ve ONUN BAZI SORUNLARI ÜZERİNE , B.Brentjes
KURDISTAN UND DER NATIONALE BEFREIUNGSKAMPF DER KURDEN
ZU EINIGEN PROBLEMEN DER GESCHICHTE DER KURDISCHEN NATIONALBEWEGUNG ,
Burchard Brentjes

ŞERÊ AZADÎ

.....
Xwînxwarên axir zeman
Sêwelekên Truman,
Seîd, Qasim û Basî
Tev li zaninê asî,
Guh nedan
Tarîx, dîrok û destan,
Guhartinên van salan.
Şiyarî û yekîtî,
Jêhatî
Bûna Kurdan.
Nûrî Seîdê pîlanger
Bi mîsaq î bi peyman,
Bi kirîna nokeran,
Bi nermî, gah bi sûtan,
Bi kuştin û bi zîndan
Bi hîle û bi hiner,
Qil sal timam, ser bi ser
Dilxweş kirin Îngîlîz,
Nefta me ya wek dengîz,
Ji bi bire bi qamçî,
Dan wan kesên bê sincî,
Em bi xwe xistin bin dest,
Reben
Pêxwas
U birçî.

Dr. N. ZAZA



MEMO

Memo, sêwî bû... li ber dîwara,
Bavê kalê wî,
Di şerê Êris de, bi tîfing
Deng li topê kir...
sed mêr bela kir,
di ber Osmanî

ew hate kuştin.

Kalê wî jî mêrxasekî çê bû,
Di şerê Yewnan,
li "Dumlupınar"

bi çar birîna

serê xwe danî nava axa sar.

Li "Dara Hênê" peyayên Kemal
Bav daleqandin.

Birakî wî di zikê dê de,

teví diya wî hat singû kirin.

Memo bê xweyî, bê xwedan,

Mezin bû hat hewlê...

Bê xwendin, bê jîn,


Bû nozde salî,

Hikûmeta Tirkan ew şand Qoreyê

xwîna wî firot,

bi duwanzde dolar...

Memo GUHDERZ



◆◆◆◆◆
"Md. 3. Organizasyonumuz Orta-Doğuda yaşayan Kürt halkının, diğer halklar gibi, kendi kendisini idare etmeye hakkı bulunduğuna inanır. Bu amaca ulaşmak için, Kürt halkının temel demokratik ve milli hakkı olan oto-determinasyon (milletlerin kendi kaderlerini kendilerinin serbestçe tayin etmesi) hakkının istirdadını, vazgeçilmez bir temel şart sayar."